Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1387 21-Pûşper-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Buhayên dermanan barên nexweşan giran dike

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

**Welatiyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku buhayê nirxê dermanan ji ber bilindbûna dolar li hemberî lîreya Sûrî barê wan girantir dike û wiha gotin, "Em bi hêvî ne sînorek ji buhabûna dermanan re bê dayîn û rewşa aborî ya gel di ber çavan re bê girtin."**

Di vê dema dawî de li Rojavayê Kurdisranê nirxê derman wek xwe ye, lê tenê yê li ser dolar buha dibe. Ev yek jî ji welatiyên xizan re pir zehmete ku di vê rewşa zehmet ya jiyanî de karibin tedawiya xwe bikin, tevî ku derfeta hin kesan tune ye jî lê ji ber nexweşiyên xwe ew neçarin ku serdana bijîşk û dermanxaneyan bikin.

Di derbarê zehmetî û buhayên derman welatên bajarê Qamişlo û bijîşkê dermanxanê ji Rojnameya me re axivîn.

**'Kirîna derman ji me re buha ye'**

Welatiya bi navê Ibtîhal Yûsif diyar kir ku ji bo wan derman buha ye û derfeta wan ya zêde tune lê ew neçarin ku bikirin û wiha got: "Ji gelek kesên wek me re derman pir giran û buha ye. Îro di vê rewşa zehmet ya jiyanî de, serdana bijîjkan ji dermanên ku em dikirin buhatir e, berî demekê lênerîna bijîşkê hundirîn bi 75 hezaran bû, lê niha lênerîn kiriye bi 100 hezarê Sûrî, ev yek dihêle ku serdana welatiyan ji bijîşkan re bibe asteng. Duh min bi hezar û bîst dolarî dermanê mezinbûnê ji keça xwe re kirî, ji ber derfeta min tune bû jî lê ez neçar bûm ku ez jê re bikirim. Em bi hêvî ne ku ev dolar dakeve da ku dermanên li ser dolar jî erzan bibe û welatî karibin dermanên ji bo nexweşiyên xwe bikirin."


Ibtîhal Yûsif


Mincana Loqo


Selah Remo

**'Pir zehmetiyên min ji aliyê tedawîkirina nexweşiyan ve heye'**

Welatiya bi navê Mincana Loqo da diyarkirin ku zehmetiya wê ji aliyê kirîna dermanan ve heye û wiha anî ziman: "Îro ez dayika bi temen mez in, tevî ku nexweşiya dil bi min re ye jî duh min serlêdana bijîşkan kir û îro jî ez bi keça xwe re hatim e ba bijîşk. Duh ew çû dermanxanê du derman bi 200' hezarî kirî. Tevî ku buhaya derman ne zêde bilind e jî , lê ji gelek welatiyan re pir buha ye. Rewşa jiyanî pir zehemete ji bo wê em îro nikarin serdana bijîşkan ji bo nexweşiyên xwe yên cuda bikin. Di vê demê de nexweşî pir bûn e, ji ber wê jî derfeta hin kesan tune ye ku tudawiya xwe bikin. Lê gelek kes jî hene derfeta wan heye ku her tiştî peyda bikin."

**'Buhayên derman li Sûriyê ji welatên derdorê kêmtire'**

Dermanfiroşê bi navê Selah Remo da xuyakirin ku derman li Sûriyê ji hemû dewletên derdorê arzantire û wiha got: "Tevî ku derman ne zêde buha ye jî lê ji bo welatiyên xizan pir zehmete ku dermanên xwe bi dest bixin. Tenê dermanê li ser dolar yê ku ji derve tê buha ye, lê dermanê din li gor buhayên xwe yên berê têne firotin. Bi tayîbetî dermanên nexweşiyên giran yên ku her mih van dermanên xwe dûbare dikin yên mîna pernceşêrê, Şekir, Gurçik û hwd buha ne, ev jî ji ber buhayê astengiyan li pêşiya kesên ku ev nexweşî bi wan re hene derdixe. Divabê îro yên bijîşk û yên dermanxanê bi welatiyên xezan re li gor derfeta ku dikarin bi wan re bibin alîkar. Ji ber îro ya herî girîng di jiyanê de tendurista mirov e. Gerek ji bo van kesên xizan, rêxistin û navendên tenduristiyê çêbin û destên xwe bavêjin dewletên navnetewî ku alîkariyan ji aliyê tenduristiyê ve ji bo vî miletî bikin."



## FERHENGA BIWÊJAN

**Ez destê te nagirim:**
- Ez li pêşiya te nabim asteng; ez pêşiya te nagirim; tu çawa dixwazî wisa bike.

**Ez ez im, tu tu yî:**
-Em du kesên ji hev cuda ne; ez ne mecbûr im weke te bikim.

**Serê xwe naxe ciherê ti kesî:**
- Bindestiya ti kesî qebûl nake; serbixwe dijî; neheqiya ti kesî qebûl nake.

**Ti kes ser me re ber me re nîne:**
- Em bi keyfa xwe dixebitin; karê me bixwe ye; ti kes emir nade me.

**Tu destgur î:**
- Tu serbest î; ka tu çawa dixwazî wisa bike.

**LI SER DIZÎ**

**Destdirêj e:**
- Diziyan dike; tiştên ku ne yên wî bin dibe.

**Gavên xwe zêde dike:**
- Diziyan dike.

**Quran li ber yê diz danîn, got, vêca ez xilas bûm:**
- Ji bo yê diz sondxwarina bi Quranê pir hêsan e.

**LI SER GIRANÎ Û DESTGIRANIYÊ**

**Destgiran e/destê wî giran e:**
- Karan zû naqedîne; ne destsivik e; ne jêhatî ye; giran dixebite.

**Heta bûk fitilî, dawet betilî:**
- Destê wî giran e; dereng tev digere.

**Heta bûk/xanim/şûşan xemilî, govend betilî:**
- Bi heman wateyê.

**Heta anî serî, heft kiras qetandin:**
- Pir dereng tev digere; destê wî pir giran e.

**Tu dibêjî qey li ser hêkan dimeşe:**
- Meşa wî pir giran e; meşa wî pir bitirs e.

**LI SER MEZINAYIYÊ**

**Dest ser destan heta erşê banî:**
- Mezin ne yek tenê ye; mezin pir in; xwe mezin neke; xwe qure neke.

**Dest ser destan re ye:**
- Bi heman wateyê.

**Ketine pey paya dinyayê:**
- Derdê wan navê wan e; ew li pey navê dinyayê ketine; derdê wan fexir û mezinayî ye.

**Ser çavan re birî hene:**
- Mezin ne yek tenê ye; mezin pir in; xwe mezin neke; xwe qure neke.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Sudoku: Bersiv 79

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 1 | 2 | 8 | 7 | 3 | 6 | 4 | 9 |
| 9 | 4 | 8 | 1 | 5 | 6 | 2 | 7 | 3 |
| 7 | 3 | 6 | 4 | 2 | 9 | 8 | 5 | 1 |
| 2 | 6 | 3 | 5 | 8 | 4 | 1 | 9 | 7 |
| 4 | 8 | 5 | 9 | 1 | 7 | 3 | 6 | 2 |
| 1 | 9 | 7 | 3 | 6 | 2 | 5 | 8 | 4 |
| 3 | 5 | 9 | 6 | 4 | 1 | 7 | 2 | 8 |
| 6 | 2 | 4 | 7 | 3 | 8 | 9 | 1 | 5 |
| 8 | 7 | 1 | 2 | 9 | 5 | 4 | 3 | 6 |

Sudoku:Pirs 80

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | 9 | 1 | 2 |
| 8 | | | 2 | | | 4 | | |
| | 1 | | | 9 | | 7 | 8 | |
| | 7 | 5 | 4 | | | 8 | | |
| | | | 7 | | 2 | | | |
| | | 6 | | | 3 | 5 | 7 | |
| | 8 | 1 | | 3 | | | 9 | |
| | | 2 | | | 5 | | | 1 |
| 9 | 4 | 3 | | | | | | |

## Kongra Islama Demokratîk: Divê destûr li gorî taybetmendiyên gelên Sûriyê be

**Hevserokê Kongra Islama Demokratîk Mihemed Xerzanî destnîşan kir ku eger destûr ilmanî be, olî be, çi be ku desthilatdarî xwe li ser gelan ferz bike, yekrengiyê pêkbîne û rêzdariya cihêrengiyê negire, wê ev destûr neyê qebûlkirin. Lewma divê destûrek li gorî taybetmendiyên hemû gelên Sûriyê were sazkirin.R-6**



## Rastiya jin li pênc welatên Asyaya Navîn

Jinên Asyaya Navîn bi taybet li welatên Kazaxistan, Ozbekistan, Qirgizistan, Tirkmenistan û Tacîkistan ji bo mafên wekhevî, azadî û parastina hiqûqî di nava tevgereke mezin a guhertinê de ne; herêm gav bi gav ber bi pêşveçûnek berbiçav ve diçe.**R-2**




## Vegera koçberan bi kêfxweşî, astengî û zehmetiyan re hevrû ye



Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrîn-Sûriyê Îbrahîm Şêxo diyar kir ku piştî 8 salan ji koçberiyê di encama lihevkirina 29'ê Çileyê de gelê Efrînê vegeriyan cih û warê xwe û wiha got: "Piştî vegerê astengî û zehmetiyên gelê Efrînê hê jî didomin.**R-3**

## Zindawerên çand û hunera Kurdî: Semer Dirêî



Şêwekar Semer Dirêî; Neynika bedewiyê û giyanê afirîneriyê bû. Wê di tabloyên xwe de girîngiyek taybet dabû hebûna jinan weke sembola azadî û lêgerîna aştiyê, wê di her tabloya xwe de dîtineke taybet ji nû ve ava dikir.**R-9**

Rônahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1387 21-Pûşper-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# 'YEKRÊZIYA KURDÎ PÊDIVIYEKE STRATEJÎK E'

Rojnamevan Pêjder Altan destnîşan kir ku yekrêziya Kurdî êdî ne tenê daxwazek siyasî, lê pêdiviyeke dîrokî, siyasî û stratejîk e. Li gorî wê şert û mercên niha ferz dikin ku hêzên siyasî, rewşenbîr, rojnamevan û hemû pêkhateyên civaka Kurd li ser berjewendiyên neteweyî helwestek hevpar pêş bixin.**R-4**



## Başûrê Kurdistanê: Ji têkoşînê heta statûya federal




Herêma Başûrê Kurdistanê berî ku bi fermî wek herêmek federal were nasîn, gelek qonaxên dijwar derbas kir, lê piştî gelek salan ji xebat û têkoşînê gihiştiye statûya federal. Lê siberoja wê hîn jî bi pirsgirêkên siyasî, aborî û ewlehiyê ve girêdayî ye û hewldanên têkbirina destkeftiyên Kurdan tên kirin.**R-5**


Di avakirina modernîteya demokratîk de cihê tevgera femînîst
İsyan Karadeniz R-2


Pîvanên serkeftin û têkçûnê di şeran de çi ne?
Idrîs Henan R-4


Şerm û heya ji îmanê ne
Hafiz Ahmet Turhalli R-7


Înşakirina wateyê
Remezan Olçen R-9

# Rastiya jin li pênc welatên Asyaya Navîn

**Esma Mistefa**

Kazaxistan, Ozbekistan, Kirgizistan, Tirkmenistan û Tacîkistan îro wekî pênc welatên Asyaya Navîn têne zanîn. Di van welatan de rewş û rastiya jin di çi astê de ye herwiha zehmetiyên ku pê re rû bi rû dimînin me xweset ji we re lêkolîn bikin. Lê beriya ku em derbasî naveroka rapora xwe bibin yek ji beşên destpêkê ku divê em rastiya van welatan ya dîrokî û perçekirina wan bi kurtasî vekin da ku em mijarê watedartir bikin.




### Bi kurtasî dîroka van welatan û çawa hatine parçekirin

Kazaxistan, Ozbekistan, Kirgizistan, Tirkmenistan û Tacîkistan îro wekî pênc welatên Asyaya Navîn têne zanîn. Di dîrokê de, ev herêm ji bo gelek gelên Tirk û Îranî bûye welat û beşek ji rêyên bazirganiyê yên kevnar ên bi navê Rêya Hevrîşimê pêk aniye.

Kazaxistan: Herêm ji aliyê eşîrên koçer ên Tirkî û Mongolî ve dihat niştecîkirin, û xanatên Kazakistanê ji sedsala panzdehan û pê ve derketine holê.

Ozbekistan: Li Asyaya Navîn navendeke şaristaniya îslamî bû û bajarên wekî Semerkand û Buxara li wir geş bûn. Her wiha beşek ji împaratoriya Tîmûr bû.

Kirgizistan: Eşîrên koçer ên Kirgiz li herêmên çiyayî dijiyan, û dîrokeke eşîrî ya dirêj hebû.

Turkmenistan: Ji aliyê eşîrên Tirkmen ve hatiye bicihkirin ku bi xwedîkirina hespan û seferê navdar bûn.

Tacîkistan: Ji aliyê gelekî bi eslê xwe Farisî ve tê niştecîkirin, ew berdewamiya çandî ya şaristaniyên kevnar ên Îranî ye.

Çawa hatin parçekirin?

Di sedsala 19'an de, Împeratoriya Rûsyayê berfireh bû ber bi Asyaya Navîn ve û hêdî hêdî li ser piraniya herêmê kontrola xwe bi dest xist. Piştî damezrandina Yekîtiya Sovyetê, rayedarên Sovyetê Asyaya Navîn ji nû ve organîze kirin.

Di navbera salên 1924 û 1936'an de, hikumeta Sovyetê pêvajoyek bi navê Nîşankirina Sînoran a Neteweyî pêk anî, ku tê de herêm bi giranî li ser bingehek neteweyî û zimanî li komaran hate dabeş kirin, di heman demê de faktorên siyasî û aborî jî li ber çavan re hatin girtin. Ji encama wê ev yek hate derketin:

Ozbekistan (1924)- Turkmenistan (1924)- Tacîkistan (1929, berê beşek ji Ozbekistanê bû)- Kazaxistan (di sala 1936'an de komara Sovyetê ya tevahî)- Qirgizistan (di sala 1936'an de komara Sovyetê ya tevahî)

### Kê dabeşkirin çêkir?

Dabeşkirin ji aliyê rêveberiya Yekîtiya Sovyetê di bin serokatiya Joseph Stalin de hate kirin ku berê Komîserê Karûbarên Neteweyan bû. Siyaseta Sovyetê armanc dikir ku gelên cûrbecûr di nav komarên neteweyî yên cuda de organîze bike, lê sînorên tevlîhev xêz kir ku kêmneteweyên mezin di nav komarên din de hiştin, paşê piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê û bidestxistina van welatan di sala 1991'an de serxebûna xwe, hinek birsgirêkên sînorî derketin.

Xulase; Pênc dewletên Asyaya Navîn di piraniya dîrokê de bi sînorên xwe yên niha ne dewletên serbixwe bûn, lê beşek ji împaratorî û xanatên cûrbecûr bûn. Sînorên wê yên nûjen bi giranî di serdema Sovyetê de di salên 1920 û 1930'an de hatine avakirin, dema ku Moskowê herêm dabeşî dewletên neteweyî kir ku piştî sala 1991'an bûn dewletên serbixwe.

### Rastiya jinan li Kazaxistanê

Jinên li Kazaxistanê ji serxwebûna welêt di sala 1991'an de vir ve guhertinên girîng ên civakî û aborî derbas kirine, û di warê perwerde, kar û beşdariya giştî de pêşketinên berbiçav bi dest xistine. Jin di heman demê de di sektorên perwerde, tenduristî, xizmetguzarî û rêveberiya giştî de jî bi awayekî berfireh beşdar dibin. Lêbelê, di rêveberîya bilind û postên sîyasî de cûdahiya zayendî hîn jî eşkere ye ku temsîla jinan di navendên biryardanê de ji ya mêran pir kêmtir e.

Kazaxistan yek ji welatên herî vekirî yên Asyaya Navîn e di warê perwerde û tevlîbûna jinan di kar de, ji ber ku jin xwedî astên bilind ên perwerdeyê ne û rêjeyek mezin ji xwendekarên zanîngehê pêk tînin. Jin di aliyên perwerde, tenduristî, xizmetguzarî û rêveberiya giştî de jî bi awayekî berfireh beşdar dibin. Lêbelê, di rêveberiyên bilind û meqamên siyasî de cudahiya zayendî hîn jî diyar e ku temsîliyeta jinan di navendên biryardanê de ji ya mêran pir kêmtir e.

Yek ji astengiyên herî girîng ên ku jinên Kazaxî pê re rû bi rû dimînin, berdewamiya stereotîpên kevneşopî yên li ser rola wan di nav malbatê de ye. Beşên mezin ên civakê hîn jî dibînin ku berpirsiyariya sereke ya jinê zewaca zû, lênêrîna zarokan û birêvebirina malê ye. Di heman demê de, mêr wekî debara sereke ya malbatê tê dîtin.

Jin di heman demê de li gorî mêran ji cudahiya mûçeyan jî astengiyan dikişînin, ji ber ku beşek mezin ji wan di sektorên kêmdahat ên wekî perwerde, lênihêrîna tenduristî û xizmetên civakî de kom dibin, di heman demê de mêr di pîşesaziyên petrol, maden û endezyariyê yên ku mûçeyên wan bilind in de serdest in.

Tundûtûjiya navmalî yek ji pirsgirêkên civakî yên herî hesas li welêt dimîne. Tevî derxistina qanûn û prosedurên ji bo têkoşîna li dijî şîdeta li dijî jinan, gelek doz ji ber tirsa ji şermezarkirina civakî an zexta malbatê nayên ragihandin

Jinên li deverên gundewarî li gorî bajarên mezin ên wekî Almaty û Astana bi dijwarîyên mezintir re rû bi rû dimînin, ji ber ku derfetên kar, perwerde û xizmetên civakî li wir sînordar in, û kevneşopiyên muhafezekar di jiyana rojane de bêtir hene û bi bandor in.

Tevî van zehmetiyan, Kazakistan şahidê mezinbûnek berbiçav di çalakiyên rêxistinên civaka sivîl û tevgerên femînîst de ye ku ji bo pêşxistina mafên jinan, têkoşîna li dijî cudakarî û tundûtûjiyê, û zêdekirina beşdariya jinan di jiyana siyasî û aborî de dixebitin.

### Rastiya jin li Ozbekistan

Di salên dawî de, jinên li Ozbekistanê di warê gihîştina perwerde, kar û tevlîbûna jiyana giştî de pêşkeftinên girîng dîtine. Welat her wiha ji bo xurtkirina mafên jinan û têkoşîna li dijî cudakarî û şîdeta navmalî reformên qanûnî pêk aniye. Lêbelê, gelek jin hîn jî bi pirsgirêkên civakî û çandî re rû bi rû dimînin ku rê li ber bidestxistina wekheviyê digirin.

Yek ji astengiyên civakî yên herî girîng, berdewamiya nerînên kevneşopî ye ku rolên jinan bi zewac û lênêrîna malbatê ve girêdidin, bi taybet li deverên gundewarî. Hin jin bi zextên civakî re rû bi rû dimînin ku wan ber bi zewaca zû ve dibin an jî wan neçar dikin ku dev ji derfetên perwerde û kar berdin û li şûna wan berpirsiyariyên navmalî bigirin. Tundûtûjiya navmalî jî yek ji girîngtirîn pirsgirêkên ku jinên Ozbek pê re rû bi rû dimînin e, ji ber ku ev mijar hîn jî di hin derdoran de wekî mijarek malbatî ya taybet tê dîtin.

Her wiha jin bi pirsgirêkên aborî re rû bi rû dimînin, di nav wan de rêjeyên bilind ên bêkariyê di nav jinên ciwan de, cûdahiya mûçeyan a di navbera zayendî de, û temsîliyeta qels a jinan di meqamên serokatiyê û hin sektorên pîşeyî de hene.

### Rastiya jinan li Kirgizistanê

Jinên li Kirgizistanê li gorî hin welatên herêmê di asta perwerde û beşdariya wan di bazara kar de xwedî asteke baş in. Herwiha qanûnên nûjen destek da xurtkirina mafên jinan û zêdekirina hebûna wan di jiyana giştî de. Lêbelê, jinên Kirgiz hîn jî bi pirsgirêkên civakî û çandî re rû bi rû dimînin ku bandorê li ser rewş û derfetên wan di civakê de dikin.

Weke welantên Kazexistan û Ozbekistan ku tê de me diyar kiriye, li vir jî jin bi heman zehmetiyan û birsgirêkên civakî re derbas dibin. Hîn jî adet û kevneşopiyên muhafezekar li pêşiya jin dibin asteng, bi taybet li deverên gundewarî ku jin wekî berpirsiyarên sereke yên karûbarên malê û mezinkirina zarokan têne dîtn, ev yek jî bandorê li ser pêşketina wan di nava civakê de dike.

Diyardeya "revandina bûkê" jî yek ji mijarên herî nakok ên li welêt e. Ew pratîkek kevneşopî ya neqanûnî ye ku tê de hin jin neçar dibin ku li dijî îradeya xwe bizewicin. Her çend ev diyarde di salên dawî de kêm bûye jî, ew hîn jî ji bo rêxistinên mafên mirovan mijara gomanê ye.

Jin her wiha di hin jîngehên kar de bi pirsgirêkên têkildarî şîdeta navmalî û cudakariyê re rû bi rû dimînin, ji bilî vê yekê ku temsîliyeta jinan di meqamên siyasî û rêbertiyê de li gorî mêran qels e.

### Rastiya jinan li Tacîkistanê

Jinên li Tacîkistanê rastiyekê dijîn ku hin pêşketinên di perwerde û kar de bi pirsgirêkên civakî û aborî yên ku hîn jî bandorê li jiyana wan a rojane dikin re, dimîne. Tevî zêdebûna rêjeya keçên ku di perwerdehiyê de qeydkirî ne û beşdariya jinan di hin sektoran de baştir bûye, urf û adetên kevneperest hîn jî roleke girîng di destnîşankirina statuya jinan di nav civakê de dilîzin.

Hin ji stengiyên herî girîng ku jinên Tacîk pê re rû bi rû dimînin, ji yên din ne cuda ye ku nêzîkatiya civakê ya kevneşopî ku sereke ya jinê bi zewac, mezinkirina zarokan û birêvebirina malê ve sînordar e. Di heman demê de keç pir caran rastî zextên civakî tên ku wan ber bi zewaca zû ve dibin an jî wan neçar dikin ku dev ji xwendina xwe berdin û li şûna berpirsiyariyên malbatê tevbigerin.

Ev rastî û rewş jinên Tirkmenistanê jî jê ne dur in û hema bêje pirsgirêk û rewşa civakî ya hemû van welatan dişibe hev.

Di dawiyê de me xwest em ji nêz ve rewşa jin li van welatan hinekî lêkolîn bikin û bînin ber destê we, dibe ku ev agahî hemû ne têrker bin ji ber di nava civakan de bi sedan kiryarên nedîtî û nebihîstî derdikevin holê û di bin bêdengiya civakê de têne tepisandin. Lê ev nayê wê wateyê ku jin li van deveran ewqas bê îrade û bê rol in.

Akademiya Jîneolojî

## Di avakirina modernîteya demokratîk de cihê tevgera femînîst

**İsyan Karadeniz**

Di vê sedsala ku ber bi sedsala jinan û şoreşên jinan ve diçe de, tevgera femînîst a ku xwedî dîroka têkoşînê û tecrubeyan e, xwedî taybetmendiya paradîgmaya azadîxwaz û hevgirtiyeke modernîteya jinan e. Li dijî pergala kedxwar a qirkirina jinan û civakê û pergala kedxwar a kapîtalîst; berpirsyariya hêzên modernîteya demokratîk ew e ku bi hev re têbikoşin û çareseriyan bibînin. Ji Abya Yala heta Ewropayê, ji Asya heta Efrîqayê, ji Efganistan, heta Belucistanê, ji Kurdistanê heta Rojhilata Navîn, jin û gel û jinên ku ji bo jiyana azad û cîhanê di lêgerînê de ne, bi dirûşma Jin Jiyan Azadî dengê xwe kirin yek û bi çalakiyan hatin ba hev. Rojeva sereke ya çalakiyên deh salên dawî yên jinan, berhema vê lêgerîn û hesreta ku ji bo cîhana ji kedxwarî, tundî, bîrdoziyên zayendperest û pergala mêrdewletê paqij bûyî ye. Pirsgirêka jinan, bi polîtîkayên modernîst û lîberal çareser nabe. Çareseriya wê, guherîna ji kokê ya ferasetê, demokratîkbûna kesayet û jiyanê û guherîna civakî dixwaze. Ji bo vê yekê gavê girîng ew e ku têkoşîna bîrdozî, polîtîk û rêxistinbûyî radîkaltir û daîmî bibe.

Şerê cîhanê yê sêyemîn ku mohra xwe li çaryeka vê sedsalê daye, bi hemleyên nû berfireh dibe. Ji ber wê hem ji bo gelan, hem jî jinan ji derveyî îsrara ji bo jiyana azad û berxwedana li vê dinyayê tu vebijêrk tuneye. Jin di vî şerê ku bi pergala desthilatdar a mêr, paradîgmaya dewletî û li dora paradîgmaya civaka demokratîk mezin dibe de, aliyek in. Ji bo ku bi paradîgmaya civaka demokratîk û azadiya jinê re bi pêş bikeve û derfetên hebûn û azadiyê çêke, divê têkoşîneke hevpar hebe. Nîvê mirovan jin in û ji bo azadiyê têdikoşin, nîvê din (mêr) divê ku ji desthilatdarî, feraseta serdest werin paqijkirin. Rêber Apo tesbîta Sîmon De Beauvoir a "Wek jin jidayîk nabî, lê dibî jin" pênase dike û dibêje: "Mêr wek hebûnek serdest tê dinyayê, lê mêrê azad jî dikare bibe." Têkoşîna azadiya jinan û rêvekirina şoreşa jinan ji bo civaka demokratîk, ekolojîk girêdayî çareseriya pirsgirêka azadiyê ya mêran e. Têkoşîna jinan a ku mêran ji derve bihêle dê bibe têkoşîneke ku civakê ji derve dihêle û nagihîje serkeftinê. Rêber Apo diyar dike ku di bingeha pirsgirêka jinan de pirsgirêka mêran heye û ji bo vê têgeha "kuştina mêr" formulasyona demokrasî û sosyalîzmê ya ji bo derbaskirina desthilatdariya dewlet û desthilatdariyê ye. Beşên femînîst ên ku mêr hevgirtiyên xwezayî yên demokratîk û civaka azad dibînin jî ev tesbît rê nîşan dide.

Wek zanista şoreşa jinan û hevjiyana azad jineolojî, dema ku sosyolojiya azadiya dihûne, hem tevgera femînîst ji bo xwe bingehîn dibîne, hem jî ji bo xalên xitimandî rast tesbît bike û derbas bike, dibe bingeh. Di têkoşîna azadiya jinan de cihekî girîng ê tevgera femînîst heye. Ji bo hînbûna tecrubeyên ku bi têkoşîna jinan çêbûne, ji têkçûn û destkeftiyan dersên wekhev werin girtin, hevgirtina jinan a demokratîk bi pêş bikeve; peywireke dîrokî û rojevî li pêşiya tevgerên jinan ên dinyayê heye. Di vê sedsalê de pêdiviya herî lezgîn ew e ku ev hevgirtin bibe bingeha konfederalîzma jinan a demokratîk. Modernîteya demokratîk, serdema modernîteya jinan û şoreşên jinan e. Bi kûrkirina rêxistinkirinê, bi pêşxistina rêbazên dewlemend ên têkoşînê, pêdiviyên vê serdemê dikarin werin bicîh anîn.

Li dijî faşîzm, kapîtalîzm û pergala mêtinkariya cîhanî em dikarin xwedî li ked, beden, çand û axa xwe derkevin. Ji çandên cuda, erdnîgarî, bawerî û neteweyan, jin dikarin bi rêxistinbûnên xwe yên xweser, paradîgmaya azadiya jinan jiyandar bikin. Ev yek dê dewlemendiya konfederalîzma jinan a demokratîk derxe holê. Tevgera femînîst bi cîhgirtina avakirina konfederalîzma jinan a demokratîk a cîhanê de dê bikaribe tecrubeyên xwe yên dîrokî, ji bo jiyandarkirina paradîgmaya azadiyê bi kar bîne, di têkoşîna azadiya jinan de û avakirina jiyana azad de roleke mezin bilîze.



# Girîngiya stratîjîk ya tengavan û bandora wê li ser bazirganiya cîhanî

**Tengav û dergehên deryayî yek ji hêmanên erdnîgarî ne ku dîroka bazirganiyê di cîhanê de pêkaniye. Herwiha ev dergeh ne tenê derbasbûna keşteyan hêsan dike, lê belê xalên kontrolkirina statîjîk ya tevgera enerjî û kelûpelan di navbera parzemînan de temsîl dike.**

**Jîn Hisên**

Dergeh û tengavên avê roleke sereke û girîng di girêdana derya û okyasnosan de, dilîze. Herwiha dihêle ku dûrahiya derya, dem û lêçûnan kêm bike, li şûna rêwîtiya li derdora parzemînan, dergeh û tengav dihêle ku derbasbûn bi awayekî rasterast çêbibe, ev yek bandorekê li ser buhayên kelûpelan û rêzedabînkirina cîhanî nîşan dide, ji ber vê yekê her astengiyek ku di van dergehan de erkeve, dikare bibe sedema kirîzeke berfireh di bazarên navneteweyî de.

Girîngiya dergeh û tengavan ne tenê di aliyê aborî de sînordar e, lê dirêjî aliyê siyasî û leşkerî jî dibe. Gelek caran ev dergeh bûne cihê pêşbaziya di navbera hêzên mezin de, ji ber ku ew dikare bandorê li ser tevegera cîhanî bike di heman demê de desthilatdariyeke mezin dide dewletên ku kontrola wê dikin, ev yek dikare di demên kirîzan an pevçûnên navneteweyî were bikar anîn. Di vê raporê de em ê balê bikînin li ser 7 dergeh û tengavên herî ginîng û stratîjîk di cîhanê de.

### Tengava Hurmuz

Tengava Hurmuz di navbera Îran û Umanê de ye, ji ber cihê wê yê stratîjîk ku Kendavê bi kendava Umanê ve herwiha bi okyanosa Hindî ve girêdide, yek ji girîngtirîn dergehên deryayî di cîhanê de tê hesibandin. Ev cih ew kiriye xaleke sereke ji bo derbasbûna tankerên veguhestina petrolê yên ku ji welatên kendavê tên û ber bi bazarên cîhanî ve diçin.

Dirêjahiya wê nêzî 176 kîlometre ye, firehbûna wê di navbera 52 kîlometre ye di xala herî berfireh ji tengavê û nêzî 33 kîlometere di xala herî teng de.

Di tengavê de ji sedî 20 ji dabînkirinên petrola cîhanî tê de derbas dibe, welatên hilberîner ên enerjiyê bi aweyekî mezin ji bo hinardekirina kelûpelên xwe bi tengavê re girêdayî ne, her astengiyeke an kirîzeke ku di tengavê de derkeve, dikare bandorê li ser buhayên petrolê di cîhanê û aboriyên dewletên mezin de, bike.

Di dema dawî de Pasderên Şoreşê yên Îranê girtina tengavê li pêşiya derbasbûna keşteyan raghandibû, bi taybet yên girêdayî DYA û Îsraîlê ve. Ev yek wekî bertekek rasterast li ser êrişên leşkerî ku li dijî Îranê di Sibata 2026'an de pêk hat, hat nîşan dan. Vê helwestê hişt ku tevgera keştevaniya bazirganî di tengavê de heta astekê bê rawestandin, ji ber xeteriya êriş û gefên ewlehiyê.



### Kanala Suweysê

Kanala Suweysê li Misrê yek ji girîngtirîn kenalên avê di cîhanê de ye. Ew Deryaya Sor bi Deryaya Spî ve girêdide, herwiha rêyeke kurt di navbera Ewropa û Asya dabîn dike bêyî ku li derdora parzemîna Afrîqayê bigere. Kenal roleke girîng di bazirganiya cîhanê dilîze, bi taybet tankerên petrol û gazê. Di heman demê de çavkaniyeke sereke ji bo derbara ewlehiya Misrê ye û rasterast bandorê li ser aboriya cîhanî dike.

Kolandina Kanala Suweyşê di serdema waliyê Misrê Seîd Başa sala 1858'an dest pê kir, ku destûrnameya xebata kolandinê dabû kompaniyeke Fransî bi serokatiya Ferdinand de Lesseps. Proje derdora 10 salan dewam kir û bi fermi di 17'ê cotmeha sala 1869'an har vekirin di serdema Xidêwî Îsmaîl.

### Tengava Bab Mendeb

Tengava Bab Mendeb ji okyanosa Hindî ber bi deryaya Ereb û kendava Eden dirêj dibe, di rêya Bab Mendeb ber bi Deryaya Sor piştre Deryaya Spî di rêya Kanala Suweyşê, sînorê wê ji aliyê Asya Yemen e û li aliyê Afrîqî Cîbotî û Erîtiya ye.

Rûbera di navbera herdu qeraxên tengavê de, ji Ras Menhaliyê li aliyê Asyayê heta Ras Siyan li aliyê Afrîkayê, nêzîkî 30 kîlometreyan heye, di heman demê de firehiya kanala keştevaniyê ya di navbera Girava Perim û parzemîna Afrîqayê de nêzîkî 16 kîlometreyan e, kûrahiya wê digihêje navbera 100 û 200 metreyan, ku ev yek wê dike herêmek pir guncav ji bo derbasbûna keşte û tankeran di her du aliyan de.

Tengav xwedî stratîjiyeke girîng e, ew yek ji rêyên deryayî yê herî kurt di navbera rojhilatê Asya û Ewropa de ye, ji ber cihê wê di navbera quncika başûrê rojava yê nîvgirava Erebî û rojhilatê Afrîqayê de.

Beşek mezin ji keşteyên ku di navbera Asya û Ewropayê de diçin û tên, ji wir derbas dibin, ev yek wê dike xaleke derbasbûnê ya sereke di rêze dabînkirinên navneteweyî de, herwiha ew bi rêyên deryayî yên herî kurt ve rasterast bi bazarên cîhanî ve girêdide.

### Tengava Cebel Tariq

Tengava Cebel Tariq di navbera bakurê Muxrib û başûrê Spaniyayê de ye, digel hebûna herêma Cebel Tariq ya di bin serweriya Birîtaniyayê di aliyê wê yê Ewropî de, ev yek hebûneke stratîjîk a bi bandor dide Birîtaniya di vê dergeha girîng de, ku Deryaya Spî bi okyanosa Etles girêdide. Dirêjahiya tengavê nêzî 51 kîlometre ye û firehiya wê di navbera 14 û 32 kîlometre herwiha kurahiya wê zêdetirî 300 metre ye.

Girîngiya wê ji ber ku ew rêyeke sereke ji bo tevgera keşteyan di navbera Ewropa, Afrîqa û Amerîkaya bakur û başûr de ye, ev yek wê dike xaleke sereke di bazirganiya cîhanî de, herwiha dibe alîkar ku gelek bazaran bi rêyeke deryayî ya yekane ve girê bide.

Di heman demê de Tengava Cebel Tariq xwedî girîngiyeke leşkerî û siyasî ye, ji ber ku nêzîkî parzemîna Ewropayê ye û yek ji girîngtirîn deriyên deryayî yên cîhanê di destê wê de ye.

Di nav nakokiyên herî berbiçav ên ku çêbûne, ew ên ku bi pêşbaziya kolonyalîst a ku bi sedê salan ve di navbera hêzên Ewropî, nemaze Brîtanya û Spanyayê de ve girêdayî ne. Brîtanyayê di sala 1704'an de kontrola xwe li ser herêma Cebel Tariq danîbû, dema ku hêzên Brîtanî-Holandî herêm bi dest xistin. Ev kontrol paşê bi fermî di Peymana Utrechtê ya sala 1713'an de hate detsnîşan kirin, ku tê de Spanyayê tawîza Cebel Tariq bo Birîtaniyayê kir. Herwiha di navbera Muxrib û Spanyayê de li ser hin giravên piçûk ên nêzîkî tengavê wek Girava Leyla (Tora), nakokiyên dubare derketin holê, di sala 2002'an de krîzek sînorkirî derbas kir, ev yek hesasiyeta rewşa ewlehî û serweriyê ya li herêmê nîşan da.

Her çend ev nakokî di serdema nûjen de nebûne pevçûnên mezin jî, cihê stratejîk ê tengavê ew dike navenda eleqeyeke leşkerî û siyasî ya berdewam ji bo hêzên herêmî û navneteweyî, ji ber ku hemû alî dixwazin piştrast bikin ku navîgasyon tê de aram û ewle bimîne.

### Kenala Benma

Kenala Benma li Amerîka Navîn e, ew dergeheke avî ya çêkirî ye, okyanosa Hadî û Etlesî di rêya Benma bi hev girêdide.

Dirêjahiya wê 82 kîlometre ye, li gorî hejmarên ji Banka Navdewletî ji sedê 5 ji bazirganiya cîhanê tê re derbas dibe, niha salane bi buhayeke nêzî 270 milyar dolar ji kelûpelan tê re derbas dibe.

Ev kenal roleke girîng di bazirganiya cîhanî de dilîze, bi taybet di veguhestina kelûplan di navbera Amerîka başûr û bakur herwiha Asya de. Ji bo zêdekirina kapasîteya wê ya wergirtin û veguhestina mîqdarên mezintir ên keştî û kelûpelan, xebatên nû yên pêşketin û berfirehkirinê hatine kirin, da ku ew bikaribe bi zêdebûna berdewam a bazirganiya cîhanî re gav bi gav biçe.

Xebatên kolandina Kanala Benmayê di sala 1881'an de bi înîsiyatîfeke Fransî ya bi serokatiya Ferdinand de Lesseps dest pê kir, di wê demê de Benma beşek ji Kolombiyayê bû. Lêbelê, proje têk û rawestiya, piştî Benma ji Kolombiyayê bi piştgiriya Amerîkayê cuda bû di sala 1903'an ji nûve dest pê kir. Kanal di 15'ê Tebaxa 1914'an de, di dema serokatiya Woodrow Wilson de yê Amerîkayê, hate temamkirin û bi fermî hate vekirin. Serokê Banamayê wê demê Belisario Porras Barahona bû, ku di navbera 1912 û 1916'an de hukim girt.

Piştî vekirina kenalê bi dehê salan di bin desthilatdariya Amerîkayê de ma, ev yek hişt ku rageşî û bertekên berfireh li Benmayê derkevin holê. Di sala 1964'an de di navbera gelê Benmayê û hêzên Amerîkayê pevçûneke xwînî rû da.

Di salên 70'ê de, di rêya peymanan de serweriya kenalê gihaşt Benma û bi fermî ev yek di sala 1999'an de hat bidest xistin. Tevî bidawîbûna pevçûna serweriyê, heya niha jî kenal bi astengiyên siyasî û aborî rû bi rû dimîne, lewma carnan bandorê li ser tevgera nîvîgasyonê dike û ji nû ve balê dikşîne li ser girîngiya wê ya stratîjîk.

### Tengava Melqa

Tengava Melqa di navbera Malezya û Endonezya de ye. Yek ji dergehên deryayî yên herî qerebalix di cîhanê de ye, okyanosa Hindî û Deryaya Çînê ya başûr bi hev girêdide. Ev tengav rêyeke sereke ji bo keşteyên bazirganiyê di navbera Rojhilata Navîn û rojhilatê Asya temsîl dike.

Girîngiya wê diyar e ku ew rêya herî kurt e ji bo veguhestina petrol û kelûpelan bo aboriyên mezin ên wekî Çîn û Japonya, ev yek wê dike hêmaneke sereke di rêze dabînkirinên cîhanî de û gelek welat ji bo misogerkirina herikîna domdar a madeyên xav û enerjiyê pê ve girêdayî ne.

Yek ji wan zehmetiyên herî berbiçav ên ku hat dîtin, belavbûna (korsanîya deryayî) bû, bi taybetî di navbera salên 2000 û 2005'an de, dema ku keşteyên bazirganî li hin deverên hesas ên tengavê rastî êrişên dubare hatin, ku ev yek hişt welatên herêmê yên wekî Malezya, Endonezya û Sîngapûrê hevkariya ewlehiyê xurt bikin û dewriyeyên hevbeş pêk bînin.

### Tengavên Bosfor û Dardanelê

Tengava Bosforê, li Stenbolê, Tirkiyeyê ye, parzemînên Asya û Ewropayê ji hev vediqetîne, Deryaya Reş bi Deryaya Mermarayê ve girêdide. Ji ber cihê xwe yê erdnîgarî, ew yek ji girîngtirîn tengavên xwezayî yên cîhanê ye. Dirêjahiya wê 32 kîlometre ye û firehiya wê di xala xwe ya herî fireh de di navbera 700 metre û 3,5 kîlometreyan de diguhere.

Ev tengav di veguhestina petrol, gaz û kelûpelan ji welatên Deryaya Reş bo bazarên cîhanî de roleke girîng dilîze. Herwiha ew rêyeke sereke ye ji bo keşteyên bazirganî û leşkerî, Tirkiye li gorî peymanên navneteweyî rêxistina trafîkê tê de kontrol dike.

Girîngiya wê jî ew e ku ew xalek hevdîtinê di navbera Rojhilat û Rojava de ye, ku ev yek jî aliyekî jeopolîtîk ê berbiçav dide wê. Her wiha ji ber hesasiyeta cihê wê û bandora wê li ser hevsengiyên navneteweyî, ew di ewlehiya herêmî de hêmanek bingehîn pêk tîne.

Tengava Dardanelê jî di nav Tirkiyê de ye û Deryaya Egeyê (ku beşek ji Deryaya Spî ye) û Deryaya Mermarayê ya li Tirkiyê bi hev ve girêdide. Ew dirêjkirina Tengava Bosforê ye di nav rêyên avê yên Tirkiyê de ku Deryaya Reş bi Deryaya Spî ve girêdide

Tengav xwedî girîngiyeke statîjîk a mezin e, wek rêyeke derbasbûna keşteyên bazirganiyê ku kelûpelan di navbera Ewropa û Asiya vedguhezînin, tê bikar anîn. Herwiha ew beşeke ji pergala navîgasyona navdewletî ku bi rêkûpêk pêk tîne, ye.

Her du tengav li gorî Peymana Montreux a 1936'an di bin kontrola Tirkiyê de ne.

# Diplomasiya Kurdî li Ewropayê: Gera Li Garantiya Pêşerojê û Sazkirina Çareseriyê

**Cemîl Xoce**

Herêm di demeke pir hesas de şahidiya tevgereke dîplomatîk a Kurdî ya berbiçav dike. Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) General Mezlûm Ebdî û Hevseroka Daîreya Têkiliyên Derve Rêzdar Îlham Ehmed vê tevgerê bi rê ve dibin. Ev gera Ewropayê ya niha xwedî wateyên siyasî yên kûr e. Ew di demekê de tê ku nîqaş li ser birêkûpêkkirina têkiliyên navbera Şam û Rêveberiya Xweser zêde bûne.

**•Destpêkirina Hemleyê û Stasyonên Armanckirî**

Tevgera dîplomatîk bi fermî di 5'ê Hezîranê de dest pê kir. Ev tevger bi hewildanên Dr. Ebdulkarîm Omer û Rêzdar Îlham Ehmed ligel tîma rêxistinê li Ewropayê dest pê kir. Van hevdîtinan rê ji bo serdana niha ya General Mezlûm Ebdî re amade kir. Ev ger stasyon û paytextên ewropî yên girîng û bibandor li xwe digire. Ji van stasyonên herî girîng Parîs, London, Washington, Bonn, Roma, Bruksel, Amsterdam, Stockholm û Oslo ne.
Beriya vê gerê, hevdîtinên giring li Herêma Kurdistanê pêk hatin. Di wan hevdîtinan de şandeyê ligel Nûnerê Serokatiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Tom Barrack û Serokê Herêmê Nêçîrvan Barzanî rûniştin.

**• Armancên Sereke û Lêgerîna Garantiyan**

Rêveberiya Xweser bi rêya vê gera lezgîn hewl dide armancên stratejîk û zelal bi dest bixe:
1.Komkirina Piştgiriya Siyasî: Armanca serdanê komkirina piştgiriya navdewletî ji bo gerantîkirina mafê Gelê Kurd di xwerêvebirina herêmên xwe de.
2.Parastina Taybetmendiyê: Tekezîkirina li ser çespandina taybetmendiya herêmê di aliyên siyasî, leşkerî û aborî de.
3.Bibîrxistina Garantorên Navdewletî: Daxwazkirina ji hêzên navdewletî ku sozên xwe yên berê yên dane herêmê, bi cih bînin.
4.Sepandina Peymanê: Daxwaza garantiya sepandina tam û giştî ya bendên peymana 29'ê Çileya 2026'an.
5.Îstîqrara Xweser: Tekezkirina li ser birêvebirina herêmê ji aliyê gelê herêmê bi xwe ve, bêyî navbeynkar an çavdêrekî ji Şamê, û dûrxistina herêmê ji pevçûnên herêmî yên pêşerojê.

**• Diplomasiya Paralel û Bihêzkirina Helwesta Danûstendinê**

Ev serdan di qonaxekê de tê ku zext li ser entegrekirina saziyên leşkerî û îdarî di nava dewleta Sûriyeyê de zêde dibin. Ji ber vê yekê, Rêveberiya Xweser tevgera xwe ya dîplomatîk zêde dike da ku destkeftiyên xwe biparêze. Ev ger berdewamiya "dîplomasiya paralel" a Rêveberiyê nîşan dide. Armanca wê ew e ku rê li ber girtina pêşeroja herêmê tenê di çarçoveya hevsengiyên navxweyî yên Sûriyeyê de bigire.

Ev tevger nayê wateya redkirina diyaloga ligel Şamê. Lê, ew hewldanek e ji bo bihêzkirina helwesta danûstendinê ya rêveberiyê di pêngavên pêşerojê de. Şande îspat dike ku rêveberî xwediyê kanalên peywendiyê yên rastexast û bibandor e ligel paytextên herî mezin ên Rojavayî û ew aktoreke sereke ye di herêmê de.

**•Nirxandina Ewropî û Têkoşîna Dijî Terorê**

Aliyê ewropî giringiyeke mezin dide berdewamiya peywendiya ligel Rêveberiya Xweser. Rewşa li Sûriyeyê hîn jî dikare biguhere û şahidiya surprîzan bike. Hinek derdorên Ewropî di wê baweriyê de ne ku divê hêza leşkerî ya Kurdî her dem di amadebaşiyê de be. Armanc ew e ku her valahiyeke gengaz di eniya têkoşîna dijî terorê de were dagirtin e.
Vebûna Ewropayê bi ser Rêveberiya Xweser de, berdewamiya girîngiya rêveberiyê di mijarên ewlehî, îstîqrar û têkoşîna li dijî terorê de nîşan dide, lê ew nayê wateya ku her tişt temam e û gerantiya navneteweyï ketiye berîka me de, ji ber ku divê em vê ji bîr nekin ku dewlet her tim li gorî berjewendiyên xwe tevdigerin. Ev gera dîplomatîk ne tevgereke asayî ye, belê tevgereke stratejîk e ji bo xêzkirina rûyê qonaxa pêşerojê. Divê piştgiriya derve wekî garantiyeke mutlaq neyê dîtin, ji ber ku berjewendiyên dewletan her dem diguherin. Lê serkeftina rastîn di çespandina Rêveberiya Xweser de ye wekî hevalbendeke sereke ku nayê paşguhkirin di sazkirina her çareseriyeke siyasî ya pêşerojê de ji bo Sûriyeyê û mîsogerkirina ewlehî û îstîqrara Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê.

# Jiholêrakirina îrade an berxwedana gel?

**Botan Amed**

Dema ku em sedsala dawî ya dîroka Rojhilata Navîn lêkolîn dikin, rastiyek zelal derdikeve holê: li vê herêmê tu hêzek tenê naxwaze axê birêve bibe. Hêz her wiha dixwazin bîr, nasname û vîzyonên pêşerojê kontrol bikin. Ew dizanin ku serdestiya tevahî li ser gel bêyî şikandina îradeya wan nayê damezrandin. Aloziyên heyî yên di navbera hikûmeta navendî ya Iraqê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê de, nîqaşên li ser rewşa hêzên Pêşmerge û hevkêşeyên nû yên der barê pêşeroja Şingalê de ji vê rastiya dîrokî serbixwe nînin. Li ser rûyê erdê, dibe ku ev wekî mijarên teknîkî, qanûnî an ewlehiyê xuya bikin. Lêbelê, lêkolînek kûrtir eşkere dike ku pirsgirêka rastîn ne çek e, lê îrade ye. Ji ber ku li Rojhilata Navîn, şiyana gel ji bo ewlekirina ewlehiya xwe ne tenê mijarek leşkerî ye. Ew di heman demê de nîşanek e ku gelo ew gel dê di pêşeroja xwe de xwedî gotin be. Civakên ku saziyên xwe ava dikin, zimanê xwe diparêzin û xwerêxistinkirina xwe pêş dixin ne tenê niha lê di heman demê de pêşerojê jî ava dikin. Ji ber vê yekê, ji bo navendên hêzê, pirsgirêka rastîn pir caran ne çek e, lê rastiya civakek rêxistinkirî ye. Ezmûna Rojava, ji ber vê sedemê, nikare tenê wekî pêşveçûnek herêmî were hesibandin ku di nav sînorên Sûriyeyê de derketiye holê. Tevî hemû kêmasî û nakokiyên xwe, Rojava îdîayek pêşkêş kiriye ku gel dikarin bi hev re bijîn, jin dikarin di navenda jiyana civakî de bin, û nasnameyên cûda dikarin li ser zemîneke siyasî ya hevpar bicivin. Ev îdîa ne tenê avahiyek leşkerî ye; ew di heman demê de pêşniyarek îdeolojîk û civakî ye. Ji ber vê yekê, ravekirina zextên li ser Rojava tenê bi polîtîkayên ewlehiyê têrê nake. Ji ber ku pirsgirêk ne tenê kontrola herêmekê ye, lê di heman demê de pêşeroja modelek civakî ya alternatîf e. Bi heman awayî, Şengal ne tenê çiyayek an jî wargehek e. Şengal bîranîna gelekî ye ku hewl dide piştî trajediyek mezin ji nû ve rabe. Her saziyek civakî ya ku li wir hatiye damezrandin celebek berxwedanê ye ku armanc dike ku êşên hatine jibîrkirin neyên jibîrkirin. Ji ber vê yekê, her nîqaşek li ser pêşeroja Şengalî di heman demê de nîqaşek li ser pêşeroja bîr û xwerêxistinkirinê ye. Ji her du perspektîfan ve, du xetên bingehîn di seranserê dîrokê de li hev ketine. Li aliyekî têgihîştina navendîparêz a desthilatdariyê heye. Ev têgihîştin civakê wekî tiştek ku were rêvebirin dibîne. Ji aliyekî din ve, nêzîkatiya demokratîk heye ku li ser bingeha kapasîteya civakê ya xwerêvebirinê ye. Ev nêzîkatî gel wekî mijarên siyasetê nas dike. Ev nakokî di dilê nîqaşên îroyîn de ye. Li aliyekî têgihîştinên ku ji bo navendîkirina ewlehî, siyaset û mekanîzmayên biryardanê diparêzin hene. Li aliyê din jî nêzîkatiyên ku ji bo parastina îradeya herêmî, meclîsên gel, pirrengiya çandî û xwerêxistinkirinê diparêzin hene. Esasê pevçûnê pir caran li vir e. Ji ber vê yekê, xwendina pêşketinên îroyîn tenê wekî krîzên dîplomatîk ên rojane dê ne temam be. Pirsgirêka rastîn ew e ku Kurd û gelên din ên li herêmê dê heta çi radeyê di pêşeroja xwe de xwedî gotin bin. Ji ber ku zimanê gel ne tenê amûrek ragihandinê ye; ew nêrînek cîhanê ye. Çanda gel ne tenê ji kevneşopiyan pêk tê; ew hilgirê bîra wan a dîrokî ye. Saziyên gel ne tenê avahiyên îdarî ne; ew temsîla îradeya wan a kolektîf in . Ji ber vê yekê mijara îradeyê li Rojhilata Navîn mijara herî bingehîn dimîne. Pirsa ku di navenda hemû nîqaşên îro de ye, bi rastî pir hêsan e: Gelo mafê gelan heye ku pêşeroja xwe diyar bikin, an jî pêşeroja wan dê ji hêla kesên din ve li ser navê wan were şekildan? Bersiva vê pirsê dê ne tenê pêşeroja gelê Kurd, lê ya hemû gelên ku li Rojhilata Navîn dijîn diyar bike. Ji ber ku azadî ne tenê bi xêzkirina sînoran, lê di heman demê de bi civakek ku di çarenûsa xwe de xwedî gotin e jî, wate digire. Ev rastiya ku dîrokê nîşan daye ye: demên bindestiyê demkî ne, lê lêgerîna gelan ji bo azadiyê mayînde ye. Ji ber vê yekê, têkoşîna di navbera îrade û serweriyê de dê wekî yek ji eksên bingehîn ên siyaseta Rojhilata Navîn, îro jî wekî sibê, berdewam bike.



# Vegera koçberan bi kêfxweşî, astengî û zehmetiyan re hevrû ye

Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrîn-Sûriyê Îbrahîm Şêxo diyar kir ku piştî 8 salan ji koçberiyê di encama lihevkirina 29'ê Çileyê de gelê Efrînê vegeriyan cih û warê xwe û wiha got: "Piştî vegerê astengî û zehmetiyên gelê Efrînê hê jî didomin.

**Stêrk mihemed/Qamişlo**

Koçberiya 8 salan di encama lihevkirina 29'ê çileya 2026'an de navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hikumeta demkî a Sûriyê de bi dawî bû, ku yek ji xalên sereke yê wê peymanê vegera koçberan bû. Lê piştî ku 8 kerwan ji herêma Cizîrê û Kobanê vegerşyan jî lê hin ji gelê Efrînê bi zehmetî û astengiya re rû bi rû ne. Erebên ji hewirdor ango yên ku ji Dêre Zor, Hesekê, Ebo Kemal û Bakurê Helebê malê xelkê venagerînin heya ku pere û macên mezin nedin. Di vê derbarê de Berpirsyarê rêxistina mafê mirovan a Efrîn-Sûriye Îbrahîm Şêxo ji Rojnameya me re axivî.

**"Di encama pêkanîna lihevkirinê de 8 kerwan ji koçberên Efrînê vegerîn warê xwe"**

Îbrahîm Şêxo daxuyakirin ku vegera koçberan guhertina demografîk rawestand û wiha got: "Piştî rêkeftina 29'ê çileyê di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hikumeta demkî a Sûriyê de hevpeymaneke hate îmze kirin, yek ji xalên sereke yê vê peymanê vegera koçberên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî bû. Di çarçoveya pêkanîna peymana li ser erdê 8 kerwanên koçberên Efrînê ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê vegerîn Efrînê, 7 kerwan ji herêma Cizîrê bûn û yek jî ji kobanê ber bi Efrînê ve rêketin.




Bi giştî derdora 7 hezar 700 û 20 malbat weke ku ji aliyê berpirsên vê peymanê ve hatiye raghandin vegerîn warê xwe. Ev gaveke girîng û dîrokî bû ji bo vegera xelkê me li ser axa xwe, herwiha vegera van guhertina demografîk yê ku di herêman de çêdibe vala derxistin. Ev jî serkeftinek ji bo gelê Efrînê careke din karîbûn ku vegerin warê xwe Çiyayê Kurmênc."

**"Mal û milkên xelkê Efrînê venegerin heya ku bacan nedin"**

Îbrahîm Şêxo tekez kir ku erebên hewirdor mal û milkên xelkê Efrînê venagerînin û wiha pê de çû: "Hin ji pêkhateyên Ereb ji cih û warê xwe derketibûn û derbasî Efrînê bibûn ev jî derketin û çûn malên xwe. Lê heta niha jî hejmareke ji wan di malê xelkê Efrînê de ne, piştî ku gelê Efrînê vegerî û daxwaza malê xwe ji wan kesan kirin bûn astengî li pêşiya wan. Mal û milkê koçberên vedigerin di dest erebên hewirdor dene, piraniya wan kesan li bajarê Efrînê û bajaroka Cindrêsê dimînin, ew bi xwe ji Dêre Zor, Ebo Kemal, Hesekê, Bakurê Helebê û Hirêtanê ne heya niha hin di bajarê Efrînê de ne. Ev kes di dema rêjîma Baas de ji ber hin pirsgirêkan ji mal û bajarê xwe koçber bûne, lê piştî ku di 8'ê Kanûna 2024'an de Rêjîma Baas hilweşî û hikumeteke nû hate ser desthilatdariya Sûriyê diviyabû ku vegerin war û herêmên xwe, lê heya niha jî bi derbasbûna salekê li ser ketina rêjîma baas û hatina hikumeta demkî a Sûriyê re ev kes venegerî ne û hinceta wan tune ye ku neçin warê xwe.
Gelê Efrînê di encama rêkeftina 29'ê Çileyê û di encama lihevkirinekê de vegerin warê xwe divê ev kesên ku ji warê xwe derketina û derbasî Efrînê bûne ev jî vegerin warê xwe, hejmareke malbetan di hindur Efrîn û cindirêsê de ne herî kêm 3'ê hezîran e. Piraniya wan malbetan jî ji bo ku ji malê Efrîniya derkevin bacên bi dolaran û hejmarên mezin dixwazin. Ji bo vê û ji bo pêkanîna xalên lihevkirina 29'ê Çile hikumete demkî berpirsyar e, divê ku wan malbetên ji Dêre zor, Hesekê, Ebo Kemal û hwd vegerînin û malê xelkê Efrînê lêvegerînin heya niha ji sedî 25 di malbetên Ereb di male Efrîniyan de ne û piraniya wan girêdarî komên çeteyan a ku bi ser dewleta Tirk ve ne. Ji bo vê ji gelê Efrînê piştî vegerê mecbûr dibin ku derbasî kolgehên niştecihbûnê ya li gundê Keferûnê bibin û hin jî derbasî kampên ku li gundê Tirindê hatine amadekirin dibin. Ev jî mafekî rawe ya gelê Efrînê û ew kes vê mafê binpê dike. Ev jî rexneyeke ji bo rêveberên herêma Efrînê ye."

**"Ji bo çareserkirina pirsgirêkên gel herdu aliyên ku peyman îmze kirine perpirsyarin"**

Berpirsyarê rêxistina mafê mirovan a Efrîn-Sûriyeyê Îbrahîm Şêxo axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji aliyeke din ve li navçeya Reco hin kom derdikevin nav mal û milkên xelkê û dibêjin ev mal û milk ya me ya hûn nexwediyê wan milkanin. Kes nikare berpirsyarê milkên bira an jî xizmên xwe rake anjî bi rê ve bibe ev komên çeteyan nahêlin û li pêşiya wan dibin asteng anjî dibêjin bila xwediyê wê bi xwe werin anjî em nadin. Piraniya xwe li navçeya Reco li gundê Çeqmaqa, Elendara û yên derdora wan ev tevger ji hêla hin komên çekdar ve derdikevin. Ev jî zehmetî û astengiyên mezin li pêşiya gelê Efrînê derdixin. Piranî malbat dengê xwe ji me re dişînin û gazinin ji bo vê yekê dikin.




Di heman demê de hin ji gelê Efrîn ku vegerî ne ji ber nedana malên wan mal bi kirê birine û sed dolarî didin. Herweha li beramberî wê jî derfetên kar gelek kêmin, ji bo çareserkirina pirsgirêkên ku li pêşiya gelê efrînê piştî vegerê derdikeve çareserkirina van pirsgirêkan berpirsyariya herdu aliyên ku peyman 29'ê Çileyê îmze kirine ye, ev yek jî dihêle ku gel mecbûr binînin, careke din ji bajarê xwe derkevin. Dema ku em van agahiyan dibhîzin anjî dişopînin piranî em di milê raghadinê derxînin pêş û xebat dikin, herwiha em wan agahiyan belge dikin, têkilî bi kesên têkildar re dikin û wan agahdar dikin da ku çareser bikin."

# Navenda Mafên Mirovan a Îranê :
# Zext û binpêkirinên dadgeha rejîma Îranê berdewam in

**Navenda Nûçeyan**

**Navenda Mafên Mirovan a Îranê li ser zêdebûna zextên hêzên rêjîma Îranê û dezgehên dadweriyê yên li ser xelkê Rojhilatê Kurdistan û Îranê raporek belav kir û tê de destnîşan kir ku parêzerek Kurd bi cezayê girtîgehê hate mehkûmkirin. Her wiha ji ber çalakiyên sivîl hejmarek xwendekar ji zanîngehê hatin dûrxistin.**

Navenda Mafên Mirovan a Îranê li ser zêdebûna zextên hêzên rêjîma Îranê û dezgehên dadweriyê yên li ser xelkê Rojhilatê Kurdistan û Îranê raporek belav kir.
Di raporê de hate diyarkirin ku parêzera bi navê Gulale Wetendost ku xelkê bajarê Merîwanê yê Rojhilatê Kurdistanê ye piştî ku wekaleta dosyeya girtiyên Şoreşa 'Jin, Jiyan, Azadî' girtibû ser xwe, ji aliyê Dadgeha Şoreşê ya Sineyê ve bi tohmeta 'propagandaya li dijî dewletê' cezayê 6 sal, 7 meh û 20 roj yê girtîgehê lê hatibû birîn. Gulale Wetendost ji bo bi cih anîna cezayê xwe veguhestin Girtîgeha Navendî ya Sineyê.
Hate diyarkirin ku 7 xwendekarên Zanîngeha Hunerî ya Şerîf a Tehranê ku di nav wan de du jinên bi navên Perniyan Xudabexşî û Fatime Xakpûr jî hene, ji ber çalakiyên wan ên di tevnên medya dijîtal de yên girêdayî xwepêşandanên seranser yên vê dawiyê li welat serîhildayîn, ji aliyê zanîngehê ve cezayê dûrxistinê li wan hat birîn.
Di heman raporê de hate destnîşankirin ku rewşa tenduristiyê ya girtiya siyasî ya 62 salî Fatime Sipêhrî ya di Girtîgeha Vekîlabad a Meşhedê de tê girtin, dibin metirsiyeke giran de ye.
Fatime Sipêhrî, wekî bertek li dijî binpêkirina mafên xwe û bêrêziya li hemberî rûmeta mirovî ji aliyê berpirsên girtîgehê ve, dest bi greva birçîbûnê û redkirina dermanan kiriye. Hevsozên Fatimeyê



hişyarî dan ku ger heta roja şemiyê (îro) bersiva daxwazên wê yên yasayî neyê dan, ewê li deverên cuda yên Îranê dest bi çalakiyên protestoyî bikin.
Mafê Mirovan a Îranê da zanîn ku Mehdîye Yûsifî ya 19 salî ku yek ji girtiyên xwepêşandanên dawiyê yên li welate, bi nexweşiyeke giran a dil re têdikoşe û berdewamiya girtina wê di girtîgehê de, fikarên mezin li ser rewşa wê ya tenduristiyê ava kirine.

# 'Yekrêziya Kurdî pêdiviyeke siyasî û stratejîk e'

Rojnamevan Pêjder Altan got ku yekrêziya Kurdî êdî ne tenê daxwazek siyasî, lê pêdiviyeke dîrokî, siyasî û stratejîk e. Li gorî wî şert û mercên niha ferz dikin ku hêzên siyasî, rewşenbîr, rojnamevan û hemû pêkhateyên civaka Kurd li ser berjewendiyên neteweyî helwestek hevpar pêş bixin.

**Amara Baran/Qamişlo**

Li ser girîngiya yekrêziya Kurdî, astengiyên li pêşiya wê, rola partiyên siyasî, rewşenbîr û rojnamevanan, herwiha derfetên ku di qonaxa niha de, ji bo avakirina stratejiyeke hevpar hene, Rojnamevan Pêjder Altan bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:

**Hûn wek rojnamevan kar û xebatên ku îro ji bo yekrêziya kurdî tên meşandin çawa dinirxînin?**

Bêguman em hemû kar û xebatên ku ji bo yekrêziya Kurdî tên meşandin bi nirx û girîng dibînin. Ji bo fêmkirin, çawanî û bingehek xûrt avakirin, sazkirina çalakî, konferans, platform an jî komcivîn girîng in; lê divê êdî ev bikevin pratîkê. Ji sala 1970'ê û şûnde li her çar parçeyên Kurdistanê, gelek komcivînên mezin ku hemû partî, tezgehên kurd beşdar bûne hatine çêkirin. Lê yê kêm mayî pratîkkirina wan e, her tim nîvço mane.

Di esasê xwe de ev mijar, di sedema fesihkirina PKK'ê û Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk de Rêber Apo bi awayek vekirî daniye holê. Ji ber vê yekî jî êdî gelê kurd hebûna xwe îsbat kiriye û ji bo statuyê jî van têgihiştinên ku di encama konferans, çalakî û komcivînên yekrêziya Kurd de derketine holê bizivrînin çareseriyeke pratîkî. Tevî sedsalan înkar, wêrankirin, parçekirin û bêstatûbûnê, gelê Kurd bi bedelên giran îradeya xwe ya azadiyê parastiye. Îro, ew di qonaxek dîrokî ya girîng, krîtîk û potansiyel mezin re derbas dibin. Sedsala tarî ku Kurd tê de hatin paşguhkirin, îradeya wan nehat dîtin û ji maseya danûstandinan li Rojhilata Navîn hatin dûrxistin, êdî li paş ma ye. Derfetên jeopolîtîk ên ku ji hêla vê serdema nû ve hatine afirandin, berpirsiyariyên pir girantir û girîngtir jî ferz dikin. Parçebûna dînamîkên Kurd li hember êrîşên piralî yên ji pergalên mêtînger û hêzên hegemonîk êdî nayê domandin. Hevgirtin bûye meseleyek lezgîn a jiyan û mirinê. Felsefeya yekîtiya neteweyî ya ku ji aliyê Rêber Apo ve hatî pêşxistin û têkoşîna bênavber a 50 salan a Tevgera Azadiya Kurd, vê hevpariyê ji tifaqek demkî an xwestekek retorîkî veguherandiye pêdiviyek dîrokî, sosyolojîk û stratejîk a berbiçav. Ev îradeya damezrandinê destkeftî û statuyan li beşên parçebûyî yên heyî ewle dike, ji bo pêşeroja gelê Kurd mertalek parastinê ya mutleq peyda dike.

**Di her du salên dawiyê de du konferansên yekrêziyê hatine lidarxistin û pênc partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê yekîtiya xwe ragihandin. Gelo ev xebat û helwestên ku tên meşandin Wê çiqas encamgirbin?**



Ji bo ev kar û xebatên di vê mijarî de encamgir bin, pêwîstî bi istiqrar û berdewamî heye. Ji ber ku rageşî û pêşketinên sedsala 21'emîn naşibin sedsalên derbasbûyî. Pir tişt hatin guherandin û veguherandin. Hebûna leşkerî, siyasî û dîplomatîk a aktorên cîhanî di hevkêşeya şer û kaosê ya heyî ya li Rojhilata Navîn de nayê înkarkirin. Di nîqaşên îradeya kolektîf de hevsengiya herî nazik ew e ku pêşî li van hevpeymaniyên demkî û taktîkî yên bi van hêzan re were girtin ku veguherînin têkiliyên girêdayîbûnê ku beşên an tevgerên Kurdan li dijî hev bi cih dikin. Ezmûna dîrokî nîşan daye ku tu gaveke dîplomatîk a li ser pejirandin û berjewendiyên dewletên mêtînger û hêzên serdest azadiya mayînde neaniye. Hêza stratejîk a rastîn divê ne di piştgiriya derve an korîdorên dîplomatîk ên paytextên biyanî de, lê di hêza gel bi xwe, di rêxistina bingehîn û di hişmendiya parastina xwe ya civakî de ku ji hêla jin û ciwanan ve tê rêvebirin, were gerandin. Di rêvebirina têkiliyên navneteweyî de, li şûna dîplomasiyeke parçebûyî ku teslîmî polîtîkayên sînorê mêtînger ên hêzên serdest bûye, divê îradeyek dîplomatîk a hevpar û helwestek neteweyî ku pêşeroja hevpar a her çar beşan dihesibîne were nîşandan.

**Li gor şopandina we, astengiyên sereke yên li pêşiya yekrêziyê, çine?**

Îro, astengiyên li pêşiya vê armanca girîng ne nîqaşên teorîk ên razber an jî cudahiyên îdeolojîk in; ew nakokiyên realpolîtîk ên li ser erdê û sînorên çêkirî yên ku ji hêla zîhniyeteke mêtînger a sedsalî ve hatine afirandin in. Bi wêrekî destnîşankirin û rûbirûbûna van xitmandinan ku di lîteratura siyasî ya Kurdî de pir caran têne nîqaş kirin, gava yekem û herî girîng e li ser rêya yekîtiyê. Ya herî berbiçav ji van xitmandinan, hebûna du paradîgma û nêzîkatiyên rêveberiyê yên bi awayekî dijberê-zitê hev a di nav qada siyasî ya Kurdî de ye. Ji aliyekî ve, nêzîkatiyên kevneşopî yên netew-dewletî hene ku têkiliyên pragmatîk ên aborî û dîplomatîk bi pergala hegemonîk û dewletên navneteweyî re wekî garantiya yekane ya hebûna xwe dibînin; ji aliyê din ve, Tevgera Azadiyê heye ku hêza xwe ji civakîbûnê digire ku li ser bingeha demokrasiya bingehîn, jiyana ekolojîk a rizgariya jinan û paradîgmaya Konfederalîzma Demokratîk e ku rexneyên bingehîn û radîkal li vê pergala hegemonîk dike. Her çend cudahiya zîhniyetê di navbera van her du xetan de dibe ku wekî ferqek kûr xuya bike jî, lê diyalektîka lihevhatina neteweyî, ne jiholêrakirina hevûdu, berevajî şiyana wan a hilberandina refleksek parastinê ya hevpar, li ser bingeha xaleke hevpar li wan ferz dike. Nêzîkatiyek realîst, li şûna ferzkirina yekrengiya îdeolojîk, ew e ku mirov gihîştîbûna ku wekî laşek yekane li hember gefên li ser yekîtiya neteweyî tevbigerin nîşan bide, di heman demê de rêz li şert û mercên bêhempa û modelên rêveberiyê yên her pêkhateyê bigire.

**Gelo partiyên Siyasî yên kurd, çiqas amadene ji bo yekrêziya Kurdî?**

Destpêkê, divê hemû partî, tevger û saziyên kurdî vê yekî fêm bikin; ev mijar di bin yekdestiya tevgerek siyasî, partî an jî aliyekê îdeolojîk de nayê meşandin. Tu ji kîjan rêveberên partî û saziyên kurdan dipirsî hemû jî dibêjin divê em kurd bibin yek, lê heya niha di pratîkê de pêşketinek wisa berbiçav çênebûye. Sedema wê jî me li jor anî ziman. Lê Rêber Apo di peyama xwe ya ji 24'emîn Lîjneya Giştî ya KNK'ê re şandî vê rastiyê di hêla felsefî û siyasî de bi kurahî danî holê. û Got: "Stratejiya hevpar encax bi keda hemû hêzên siyasî, rewşenbîr, jin, ciwan û saziyên civakî yên Kurd dikare ava bibe."
Di vê çarçoveyî de, lihevkirineke neteweyî ya demokratîk nayê wateya jiholêrakirina sînor û cudahîyan. Berevajî vê, hevkariya rastîn ne li ser helandina cudahîyan di selikek yekreng de ye, lê li ser şiyana wan a hevdîtina li ser zemînek demokratîk e dema ku taybetmendiyên xwe yên bêhempa diparêzin. Armanc ne afirandina yekrengiyek ji jor ber bi jêr e, pêşxistina helwestek hevpar, refleksek hevpar û helwestek bêtawîz li ser mijarên bingehîn ên derbarê çarenûsa neteweyî de ye. Girtin helwestek hevpar li ser berjewendiyên dîrokî û civakî yên gel, pêşîgirtina li hişên mêtînger ku Kurdan wekî çek li dijî hev bikar bînin û parastina destkeftiyên ku bi xebata sedsalan hatine afirandin bi hişmendiyek hevpar rêgezên exlaqî yên vê stratejiyê ne.

**Rola rojnamevan û rewşenbîran di avakirina yekrêziyê de çiye?**

Hem di hêla giştî de hem jî di mijarên wiha de, di dîrokê de yê xwedî helwest, rola esasî ya ku hemû civakan tîne cem hev rojnamevan û rewşenbîrin. Mixabin bi taybetî di çend salên dawî de di mijara yekrêziya kurdî de rojnamevan û rewşenbîran rola xwe ya esasî nelîstin û helwestek e xûrt nîşan nedan. Berovajê wî, ew jî her yek bûn aliyek û ketin bin bandora partî û tevgerên ku nêzî fikra wan in. Ango di hêla rê û rêbaz, tecrûbeyên dîrokî yên di heremên cîhanê de qewimî ne, tesbîtkirina pirsgirêkan û çareserkirina wan de pir lawaz man. Lêkolîn û zanîna derbarê vê mijarî de ji civakê re ragihandin û îrade xistina destê civakê de rola xwe zêde nelîstin û civakê nav pencê şerê taybet de hate hiştin. Ev jî hişt ku di serê civakê de netewperestî û yekrêziyê, demokrasî û dîktatoriyê, ol û olperestiyê, parastina cewherî û dagirkeriyê tevlîheviyê çêbike û şîlobûnê ava bike.

**Di dawiyê de hun dixwazin çi peyamê bidin hêzên siyasî, rojnamevan, rewşenbîr û gelê kurd?**

Mezinkirina lêgerîna yekîtiya demokratîk a kurdan, parastina deskeftiyên netewî û bihêzkirina nirxên civaka demokratîk berpirsiyariya hevpar a hemû kesan e. Ev helwest garantiya herî mutleq a mafê çarenûsî û hebûna neteweyî ya gelê Kurd e. Stratejiya hevpar a Kurdan tekane hêz e ku dikare hemû têgehên perçebûn û xirabî yên sedsalî li ser erdnîgariya me pûç bike. Di vê çarçoveyê de, divê her rewşenbîr, nivîskar, pêkhateya siyasî, jin, ciwan û saziyên civakî ya Kurd ji vê qonaxa dîrokî û berpirsiyariya giran a li ser milên xwe haydar be. Anîna îradeyên belavbûyî, parçebûyî û nakok di îradeyek hevpar a mezin de ne tenê bi bangên ji platforman, lê di heman demê de bi çareserkirina nakokiyên li ser erdê, avêtina gavên berbiçav û bi hişmendiyek neteweyî ya hevpar jî pêk were. Her gaveke wêrek a li ser vê bingehê, her diyalogeke avaker, dê reng û rêça pêşeroja me ya hevpar diyar bike. Yekîtiya neteweyî ya Kurd peywira îro ye. Bi qasî ku ev peywir were bicihanîn, gelê Kurd dê çarenûsa xwe xurttir bigire destê xwe û di pêşeroja azad a erdnîgariya xwe de roleke damezrîner û diyarker bilîze.

FENER



Idrîs Henan

## Pîvanên serkeftin û têkçûnê di şeran de çi ne?

Dema ku şer bi dawî dibin, pirsa yekem ku tê kirin ew e: kî bi ser ket? Bi gelemperî jî bersiv li gorî jimara kuştiyan, kapasîteya wêrankirinê, rûpîvana cografîk a hatiye desteserkirin û jimara çekên hatine rûxandin tê dayîn. Dîroka şeran jî girîngiya van pîvanan inkar nake, lê di heman demê de tekez dike ku ew tenê têr nakin ku mirov serkeftina rastîn destnîşan bike. Serkeftina leşkerî her tim ne serkeftina siyasî ye. Dibe ku aliyek windahiyên mezin bide, lê di wî şerî de bigihêje armancên xwe yên siyasî. Ji ber vê yekê, yek ji girîngtirîn prensîbên fikra stratejîk a nûjen ev e ku: şer bi serê xwe ne armancek e, lê amûrek e ji bo bicihanîna armancên siyasî.
Li gorî teorîsyenê leşkerî Klawzovîtz, şer bi rêbazên din berdewamiya siyasetê ye. Li ser bingeha vê nerînê, dadweriya dawî ya encamên şeran xwe naspêre tenê qewimînên qada şer, lê belê pirsa bingehîn ev e: gelo armancên siyasî yên bûne sedema şer hatine bidestxistin an na? Pisporên leşkerî jî asta siyasî û stratejîk wek girîngtirîn astên şeran dinirxînin.
Di dîrok de gelek serkeftinên leşkerî hatine nivîsandin. Lê çima armancên siyasî pêk neanîne, weke serkeftin nehatine hesibandin. Mînak; Amerîka li dijî Vêtnamê teknolojiyeke gelek pêşketî û hêzek cibilxaneyî ya bêhempa bi kar anî. Armanca wê ya siyasî û bingehîn ew bû ku herdu beşên Vêtnamê di bin serweriya hikûmeta Bakur a komûnîst de nebin yek. Ev yek pêk nehat û piştî vekişîna Amerîkayê, dewleta Vîetnamê bû yek welat û komûnîst bûn desthilatdar. Dema ku Napolyon êrişî Rûsyayê kir, qezencên gelek mezin bi dest xistin. Lê nekarî împaratoriya Rûsyayê tûşî xweradestkirinê bike. Berevajî wê yekê, pêşketinên leşkerî barê lojîstîk li ser wî zêde kirin. Ji ber vê yekê jî binkeftinên mezin jiyan kir û vekişiya. Li wir jî armancên stratejîk û siyasî yên Fransayê pêk nehatin û têk çûn.
Amerîka heman tişt li Afganistanê jî jiyan kir. Tevî ku zêdeyî 20 salan xwe wek serkeftî nîşan dida, lê di dawiyê de Tevgera Talîban ji nû ve serwer bû û Amerîka ji aliyê siyasî û stratejîk ve têk çû.
Bi van mînakên dîrokî re mirov tê digihêje ku, çendîn serkeftinên teknolojîk û leşkerî mezin bin, dema ku negihin armancên xwe yên siyasî û stratejîk, bê mane dibin. Yanî dibe ku dijminê te xwedî hêza leşkerî û teknolojiyê ya herî pêşketî be, lê dema ku nikaribe îradeya xwe li ser te ferz bike, bi ser nakeve.
Pirsa kevn ku îro xwe nû dike ya hesabên têkçûn û serketinê ne girêdayî mantelîteya kî ji kê zêdetir wêranî û ziyan gihandiye yê din, lê belê kê armancên xwe yên stratejîk û siyasî pêk anîne. Mantelîteya pîvanê ev e. Li gorî vê pîvanê jî mirov dikare wate bide lihevkirina demkî ya du mehan a Îran û Amerîkayê. Gelo Amerîka çiqas armancên xwe yên siyasî pêk anîn û karîbû bandorê li ser reftarên Îranê bike?
Tecrûbe û encamên şer û pevçûnan tekez dikin ku dibe aliyê bi hêz di gelek pevçûnan de bi ser bikeve, lê dema ku armancên siyasî pêk neyên, di şer de bi ser nakeve. Bi gotineke din, aliyê lawaz her tim ne hewce ye ku dijminê xwe ji aliyê leşkerî ve têk bibe ta serkeftî were hesibandin, lê tenê bese ku nehêle dijmin armancên xwe bi cih bîne ta wî binxîne. Ji bo nirxandin û manedanê jî divê mirov her tim têkîliya navbera şêwaza leşkerî û armancên siyasî de binirxîne, ta ku hişmendiya rasteqîn a pêvanê bi dest bixe.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî: Semer Direî

**Can Yûsiv**

Şêwekar Semer Direî; Neynika bedewiyê û giyanê afirîneriyê.
Dr. Semer Direî yek ji berêztirîn hunermendên şêwekar yên Kurd tê nasîn, ku bi amedebûn û bandora xwe li ser sahneya Kurdistanî û cîhanî diyar e, xwedan tiliyên zêrîne , ku firçeyê bi awayekî delal di nav pêçiyên xwe de digire, wekî ku tiliyên hunermendek li ser têlên tambûrê direqisin, bi vî awayî, reng vediguhere zimanek, tablo dibe welatek, û afirînerî dibe nasnameyek ku qet namire.
Semer Direî ji Amûdê ye, bajarekî ku ne tenê cihek bû, lê bû çavkaniya domdar a afirîneriyê, dergûşa çand û berxwedanê, û bîranînek zindî û nayê vemirandin.
Ew keça Amûdê ye, ev bajarê, bi qebareya xwe biçûk,lê bi mîrateya xwe pir mezine , ku mîraseke dîrokî ya kevnar di xwe de hildigire, wekî dirêjahiya bîranîna Mîtannîyan، Hûrî û Subarîyan.
Wê şopa sînemaya Amûdê, bi êşa wê ya kûr a ku bi demê re ji holê ranebû, di wijdanê xwe de kom kir, lewra ew êş bû beşek ji dîtina wê, û rehjeneka veşartî ku di reng û tabloyên wê de diherikî.
Ew ji malbateke kurd a neteweyî ,di huner û ramanê de naskirî ye. Ew keça herî biçûk a hunermend û şêwekar Ebdulrehman Direî ye, yê ku bandora yekem di avakirina hişmendiya bedewî ya wê de hebû , û ji zaroktiya wê ve deriyên afirîneriyê li pêşiya wê vekir.
Di sala 1973'an de malbat ji Amûdê derket û ber bi Helebê ve çû , di bin giraniya şert û mercên jiyanê yên dijwar de, ji bo lêgerîna jiyaneke pêtir bi aram û ewletir.
Hunermenda şêwekar Semer Direî di 17/6/1977'an de li bajarê Helebê ji dayik û bavek Kurd ( Abdulrehman Direî û Biroje Hemo ) hatiye dinyayê , û jiyana xwe di navbera Heleb û Amûdê de derbas kir، di nav malbatek welatparêz ya kevnare ,ku ji aliyê fikir û hunerê de pir dewlemend bû , ku ji heft zarokan pêk dihat: sê keç (Ebîr, Nexem û Semer) û çar kur. (Tariq, Nasir, Macid û Beşar).
Di vê jîngeha malbatî ya tijî afirînerî de,ku wênesazî bi muzîkê re tevlihev bû ,helbest bi wêjeyê re hev himbêz dikir, û huner bi hişmendiya çandî û siyasî re têkildar bû.
Van hemûyan axek bi bereket ava kir ku jêhatiya wê ji zarokatiyê ve tê de geş bû û li çavê wê li cîhaneke berfireh a bedewî û afirandêriyê vebû û hişte ku bibe navekî berçav di dîmena şêwekariya Kurdî de .
Semer yekem dersên hunerî ji bavê xwe yê şêwekar û muzîkjenê Kurd yê dîtbarî Abdul Rehman Direê'î wergirt, ku ne tenê bav bû, lê di heman demê de mamoste û rêberê wê yê yekem bû ber bi cîhanên bedewiyê ve, di piçûkatiya xwe de, wî jêhatîbûna wê ya wênesazî û stranbêjiyê keşif kir, û hestê wê yê bilind û şiyana wê ya xwezayî ya girtina awaz û rengan bi hev re fêm kir.
Di qonaxa seretayî de, jêhatiya wê bi awayekî berçav derket holê, ji ber ku wê çar salên li pey hev di warê xêzkirinê de li ser asta Sûriyê pileya yekem wergirtibû , û gelek xelatên taybet bi dest xistin, di nav wan de ya herî diyar derfeta çûyîna Koreyê da ku beşdarî festîvala wênesaziyê ya zarokan a li ser asta cîhanî bike.
Bi derbasbûna wê bo qonaxa amadehiyê, jêhatiya wê kûrtir û baldartir bû , ew baş fêrî wênesaziyê bi komir ,resas û tebaşûrê bû , û dest pê kir ku taybetmendiyên xwe yên hunerî bi bawerîyek mezintir ava bike.
Di warê muzîkê de, wê stranbêjiya şehyane a resen baş dizanî, di bin bandora hawîrdora malê de ya ku dewlemend bû ji hêla amûrên muzîkê yên cûrbecûr ve, bi lêdana mondiya (org), akordiyon û gîtarê pir zîrek bû, karî hevrêziyê bike di navbera nazikiya dengê xwe û rastiya sazbendiyê de , her wisa jî di navbera hestiyariya reng û kûrbûna derbirînê de .
Semer bawernameya hunera jinan wergirt, piştre berê xweda xwendina wênesazî û stranbêjiyê bi taybetî ,û xwe di fêrkirina solfej û lêdana piyanoyê de kûr kirbû, li Enstîtuya Bilind a Muzîkê li Helebê, li wir jî jêhatiya xwe ya akademîk ji bilî hesta xwe ya hunerî ya xwezayî pêşve xist.
Di bîst saliya xwe de ew bi karsazekî kurd re hate dest nîşan kirin û dest bi qonaxeke nû ya jiyana xwe kir, di sala 1997'an de zewicîn, paşê ew çû Romanyayê, li bajara Bûkureştê bîst û sê salan li dûrî malbat, hezkirî û welatê xwe jiya ,bi xwe re hewesa hunerê û hesreta girêdanê hilgirt bû.
Li wî bajarê dûr, wê rêwîtiya xwe ya afirîner berdewam kir û bû dayika du keçan (Malva û Jiyan), hebûna xwe ya hunerî û mirovahî domand, tevî dijwariya sirgûnê û dûrbûna dûr û dirêj di navbera wê û koka wê ya destpêkê de.
Semer Direî xwendina xwe ya seretayî, amadehî û navîn li bajarê Helebê qedand , û paşê xwendina xwe ya zanîngehê di warê hunerê de li Koleja Hunerên Bedew li zanîngeha Bûkureştê li Romanyayê pisporiya wênesaziyê domand. Li wir, kariyera xwe ya akademîk bi serkeftinê berdewam kir,û di encamê de bawernameya masterê di felsefeya hunerê de wergirt, û dûv re jî doktoraya rexnegiriya hunerî ya felsefî temam kir.
Dr. Semer ji wan hindik hunermendan e ku xurbet kiriye hêza afirîneriyê û salên xwe yên sirgûniyê terxan kir ji bo xwendin, wênesazî û ramanê , ji ber vê yekê serpêhatiya wê bû têkilheviyek ji zanist û afirîneriyê, û ji hesret û zanînê, bi vî awayî kariyera wê ya hunerî dewlemend kir û dîtina wê ya estetîk kûrtir kir.
Semer di berhemên xwe de hevrêzîyek dike di navbera xweza û laşê jinê, di hevbeşiyek dîtbarî ya balkêş de ku bala temaşevan dikişîne û bi kûrbûn û bedewiyê wê matmayî dike.
Ji ber vê yekê tabloyên wê tenê nayên dîtin, lê têne hîs kirin û jiyan kirin jî, çimkî ew bandorek eşkere li ser dil û hişmendiyê dihêlin, û temaşevan vedixwînin bo raman û kûrbûna di hûrguliyên wan de.
Dr. Samar hebûneke xwe ya berbiçav hebû ku sînorên hunera şêwekariyê derbas dike , ji ber ku ew di sala 2005'an de di festîvala "Aferîneriya Welat" de wek duyemîn cîgira şabaniyên bedewiya Sûriyê hate hilbijartin, her wiha ew wek endam di komîteya dadweriyê ya pêşangehên cil û modelê de li Sûriyê hate hilbijartin, ev jî nîşana çêja wê ya bedewî û pirrengiya pêwendiyên wê ye.
Di dema mayîna xwe ya li Romanyayê de, ew beşdarî kursên hunerî bû ji bo fêrkirina wênesaziyê ji zarokan re di nav komeleyên taybet de, di nav wan de "Komeleya Ewropî ya Rûya" di navbera salên 2005 û 2008 de,ku li wir yekrêzîk di navbera afirînerî û hînkirinê de çêkir.

Wê gelek pêşangehên hunerî li çendîn welatên Rojhilata Navîn û Ewropayê li dar xist, û beşdarî festîvalên cîhanî yên girîng bû, di nav wan de ya herî berçav ew bû ku di sala 2006'an de li Bûkureştê di festîvala wênesaziyê li ser laş (Body Painting) de asta duyemîn bi dest xist.
Di sala 2012 de, ew di nav lîsteyek ji 30 şêwekaran ji nav 400 hate hilbijartin ku karên xwe li muzexaneyên Romanyayê lidarbêxin , ji bilî bidarxistina bi dehan pêşangehên takekesî li Bûkureştê.
Herwiha wek yekem şêwekara Sûrî ya afrîner beşdarî Festîvala Navdewletî li Agadîra Muxribê dibe , di sala 2013 de,û hate xelatkirin.
Wekî din jî, ew di salên 2013 û 2014'an de beşdarî Dîdargeha Hunerên Navneteweyî li bajarê El Mahres li Tûnisê bûye di heman salê de pêşangehên takekesî li Hewlêr û Dihokê li darxist û dahata yek ji wan pêşangehan wê ji bo piştgirîkirina penaberên Rojavayê Kurdistanê û malbatên şehîdan terxan kir , di helwesteke mirovî ku kûrahiya pabendbûn û girêdana wê nîşan dide.
Her wiha di sala 2015'an de tevî komek hunermendên Kurd ên berbijêr beşdarî çalakiyên hunerî yên li Amedê bû.
Li ser asta xwecihî, ew li Helebê di çarçoveya Festîvala "Aferîneriya Welat " de di sala 2016'an de hat xelatkirin.
Navdariya Semer tenê li ser asta kurdî sînordar nema , lê ji wê derbas bû, gihîştiye asoyên Ewropî û cîhanî , bi vê yekê hebûneke hunerî ya balkêş nîşan da ku navê wê di qada şêwekariya hevdem de bûye nîşanek berbiçav.
Semer tekez kir ku wênesazî ji zaroktiyê ve beşek ji hebûna wê bû ,bi bandora bavê xwe, yê ku mamosteyê wê yê yekemîn bû ,ew dibêje:
«Bavê min huner hînî min kir, û ruhê wî rêya min xêz kir, ez jê pir bandor bûm û ez wî wek mînakeka xwe dibînim.
Wê di tabloyên xwe de, girîngîyek taybet daye hebûna jinan , weke sembola azadî û lêgerîna aştiyê, û di her tabloya xwe de, dîtineke taybet ji nû ve ava dike,ku ji hûrguliyên biçûk cîhanên serbixwe ava dike û ji rengan jî çîrokên zindî diafirîne, ku derbirîna mirovahî, bîranîn û girêdanê dike, û dibêje: "Rengên min ziman û nasnameya min e, hunera min welat û mîrnişîna min e."
Ew bi çandeke hunerî ya bilind û serbilindiyeke kûr bi nasnameya xwe ya Kurdewarî tê naskirin, tevî mayîna xwe ya dirêj li Romanyayê, wê di berhemên xwe de karakterê Kurda



yê mirovî bi bandorên Ewropî re tevlihev kir ,da ku ezmûneke hunerî ya taybet û yekta pêşkêş bike ku hem kesayetiya xwe û hem jî girêdana xwe diyar dike.
Semer dibîne ku huner peyamek bilind e ku nirxên azadî û bedewiyê diparêze, û li aliyê pirsgirêk û xemên mirovî disekine.
Çawa Semer wê ne be hunermendeke afirîner û xulqkar di huner, deng û şêwaza xwe de ,ji ber ku ew keça hunermendê şêwekar û lêdêrê bilûrê yê navdar Ebdurehman Direî ye, û xwişka her du helbestvanên kurd Ebîr û Nexem e .
Bi vî awayî, helbest bi huner re û peyv bi reng re tevlî hev bûn, da ku berhemên wê bibin wek helbestên dîtbarî ku bi çavan têne xwendin û bi dil têne hest kirin.
Piştî êşeke ku hema hema salekê dom kir bi nexweşiyeke giran، Doktora Semer êvara Pêncşemê, 31ê Tebaxa 2023'an li nexweşxaneyeke Almanyayê koça dawî kir di temenê 46 saliya xwe de û termê wê li wir, dûrî bajarê wê Amûdê, hat veşartin.
Şahbanûya hunera bedew, Dr. Semer ,di bilindahiya dayîn û afirîneriya xwe de koça dawî kir, berî ku tabloya xwe ya dawî temam bike, ew çû û firçeya xwe ya bedew sêwî hişt, rengên wê yên geş bi xemgîniyê barkirî bûn, û tabloyên wê yên afirîner li ser keviya giriyê rawestî man.
Hebûna wê ji hunerê zêdetir bû; ew giyanek bû ku qadên tarî yên di hundurê mirov de ronî dikir, û gava ew winda bû, ew ronahiyê kêm bû, lê nevemirî.
Şopên wê hê jî di her tabloyê de diherikin û dibêjin ku hunera rastîn namire, ger ku xwediyên wê oxir kir be jî.
Semer bi laşê xwe bi rêket û çû , lê giyanê wê neçû ,ew hîn jî zindî maye di tabloyên wê de, di nav rengên wê yên bedew de dijî، û di hûrguliyên wan ên bêdeng de nefes dide.
Her tabloyek ji tabloyên wê çîroka wê vedibêje ,her pêşangeh jînenîgariya wê bê gotin vedirêse. Her şopa rengan tiştek ji nebza wê hildigire ku neçûye.
Bi vî rengî, giyanên afirîner bi rastî koç nabin, lê vediguherin bermahiyek domdar ku tê dîtin û tê hîs kirin… û nayê jibîrkirin.
Ji giyanê wê yê pak re rûmet û mandarî,û ji mîrateya wê ya hunerî re, mayînde û domdarî.



Remezan Olçen

## Înşakirina wateyê

Di vê serdema ku teknolojî gihîştiye lûtkeyê û cîhana dîjîtal her kêliya jiyana me dagir kiriye de, em rû bi rûyê pirsgirêkeke nû ya hebûnê ne: Windabûna wateyê. Em her roj di torên civakî de bi sedan rû, wêne û peyaman dibînin, lê ev qerebalixiya mezin her ku diçe têkiliyên me sartir û sistir dike. Mirovekî nû derdikeve holê ku her çend bi hemû cîhanê re di nava "têkiliyê" de ye jî, di hundirê xwe de bi tenê ye û ji cîhana xwe ya rasteqîn dûr ketiye. Di sedsaleke wisa de ku her tişt ber bi sixtebûn û yekrengiyê ve diçe, pirsa herî bingehîn ev e: Em ê çawa xwe bigihînin wateya jiyanê û xwebûna xwe biparêzin?
Bersiva vê pirsê ji her demê bêtir di dilê edebiyatê û hunera vegêranê de veşartî ye. Edebiyat ne tenê rêzek ji gotinên xweş e; ew neynikek e ku rûyê me yê rasteqîn nîşanî me dide û bîra me ye ku nahêle em koka xwe winda bikin. Dema ku em çîrokekê dixwînin an li vegêranekê guhdarî dikin, em ji wê leza dîn a cîhana dîjîtal qut dibin û vedigerin ser wextê xwezayî yê mirovî. Çîrok, berevajî algorîtmayên ku tenê li gorî berjewendiyên aborî û mekanîk tevdigerin, hestên mîna empatiyê, êşê, kêfê û hezkirinê bi awayekî zindî diparêzin. Ew otantîzma ku teknolojî tune dike, edebiyat her carê ji nû ve ava dike. Mirov bi xwendin û vegêranê re fêr dibe ku li rûyê jiyanê binêre, bibîne û maneyeke kûr bide her kêliya xwe.
Ev rewş dema ku dibe mijara gelê Kurd, girîngiya xwe du qat zêdetir dike. Ji bo civakeke mîna Kurdan ku sedsalan bi rêya vegêrana devkî, bi kilam û çîrokan hebûna xwe parastiye, edebiyat meseleyeke jiyanî ye. Kurdan dîrok, nasname û xwebûna xwe ne di nav arşîvên dewletan de, lê di dengê dengbêjan û di bîra çîrokbêjan de parastiye. Îro ku teknolojiya dîjîtal sînoran radike û çandên mezin wekî şepêlekê her tiştî di nav xwe de dihelînin, rûbirûbûna me ya bi asîmîlasyona dîjîtal re hîn dijwartir e. Ev pergala nû xort û keçên Kurd ji çand, ziman û rastiya wan a civakî dûr dixe û wan di nav cîhaneke global a bêwate de asê dike.
Ji ber vê yekê, ji bo civaka Kurd vegera li ser edebiyatê û xurtkirina vegêranê, bi qasî parastina ziman, parastina otantîzm û xwebûnê ye jî. Gava ku nivîskareke/î Kurd bi zimanê xwe romanekê dinivîsîne an dema ku ciwanek li çîrokekê guhdarî dike, ew tenê nakeve nav cîhana xeyalan; ew li hemberî wê herikîna şixte û dîjîtal dibe xwedî çeper. Edebiyata Kurmancî bi hestên xwe, bi bîranînên xwe û bi şêwazê xwe yê dîtina cîhanê, dermanê wê tenêbûn û bêwatebûna ku sedsala nû tîne. Ew têkiliyên civakî û malbatî yên ku li ser ekranên telefonan parçe bûne, tenê di deryaya kûr a edebiyatê de dikarin dîsa li hev du werin girêdan û germ bibin.
Di encamê de, rizgariya me ji vê krîza wateyê ne reva ji teknolojiyê ye, lê bihêzkirina ruhê me ye li hemberî wê. Em dikarin amûrên dîjîtal bikar bînin, lê divê em nehêlin ku ew bibin xwediyê ruh û bîra me. Sedsala 21'ê çi qas mekanîk bibe, pêdiviya mirov a bi çîrokên rastîn û otantîk wê hîn zêdetir bibe. Bi taybetî ji bo gelê Kurd, her peyva ku bi kurmancî tê gotin, her rûpela ku tê xwendin û her çîroka ku tê vegêran, pêngavek e ber bi rûmeta xwebûnê ve. Ji bo ku em jiyana xwe bi mane bikin û têkiliyên xwe yên mirovî li ser bingehên saxlem ava bikin, divê em bêtir guh bidin dengê edebiyatê. Çimkî dermanê herî mezin ê li dijî tariya şixte ya dîjîtal, ronahiya xwerû û pak a çîrokên me yên rastîn e.

# Di Nexweşxaneya Neteweyî ya Qamişlo de xizmetên cuda têne pêşkêşkirin

Nexweşxaneya Neteweyî ya Qamişlo di mehekê de 6 hezar û 500 serlêdanên gel di beşa lezgîn de pêşwazî kir. Rêveberê nexweşxaneyê jî destnîşan kir ku tevî xebatên sererastkirinê, nexweşxane pabend e bi pêşkêşkirina xizmetên bijîşkî bo nexweşan.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Nexweşxaneya Neteweyî di sala 2006'an bi armanca dabînkirina xizmetên bijîşkî û dermnankirinê ji bo şêniyên bajarê Qamişlo hat vekirin. Lê piştî destpêkirina şerê Sûriyê nexweşxane ji ber paşguhkirinê di hemû aliyan de lawaz bû. Di 5'ê Mijdara 2025'an de nexweşxane ji aliyê Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser a Kantona Cizîrê ve, piştî nûjenkirin û sererastkirina wê hat vekirin da ku bikeve xizmeta gel.

### Ximeztên ku di nexweşxaneyê de têne pêşkêş kirin

Rêveberê nexweşxaneya Neteweyî Ciwan Hemê derbarê xizmetên ku di nexweşxaneyê de têne pêşkêşkirin ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Em komeke ji xizmetên bijîşkî yên berfireh ji bo nexweşan pêşkêş dikin. Di nav de tomografî (CT), MR, aboratuar û radyolojî, wekî din beşa şûştina gurçikan ku rojane ji bo nexweşan xizmetê pêşkêş dike. Di heman demê de hejmareke mezin ji kilînkên derve yên taybet di nexweşxaneyê de hene, wekî kilînka hundirîn ya gitşî, mejî, sîng, kilînka nexweşiyên livikan, dil û damarên xwînê û neştekariya mîzoyê û gurçikan, herwiha kilînîka jinan, li gel kilînkên neştekariya hestiyan û mejî û ji xeynî wê piraniya hewcdariyên bijîşkî yên nexweşan vedhewîne."

### Kar û xebatên srerastkirinê

Rêveberê nexweşxaneya Neteweyî bal kişand li ser xebatên nûjenkirin û sererastkirina nexweşxaneyê û wiha berdewam kir: "Beşên ku niha di kar de ne beşa cîrahiyê, zarokan, jin û şûştina gurçikan herwiha hin yekîniyên taybet, wekî din hin beş hene neçalak in wekî lênihêrîna awarte, beşê şewatê, nexweşiyên hundirîn ên mêran û hin beşên girêdayî zarokan ne di xizmetê de ne."

Di nexweşxaneyê de ekîbeke bijîşkî ya pispor ku ji 60 bijîşkên ji hemû pisporiyên bijîşkî pêk tê, wekî din 120 bijîşkên ji zanîngehên Sûriyê û zanîngeha Rojava derçûne perwerdeya xwe di nava bernameyên bijîşkî de berdewma dikin, herwiha 120 karmendên hemşîretiyê, li gel ji radyolojî, laboratîf, dermanxane, karmendên îdarî û xizmetê, kar dikin.

### Bîlançoya mehekê ya xizmetên nexweşxaneyê

Rêveberê nexweşxaneyê Ciwan Hamê derbarê bîlançoya xizmetên ku di meha borî de hatine pêşkêşkirin wiha eşkere kir: "209 emeliyatên cûrbecûr hatine kirin, di nav de "emeliyata giştî, jinan, guh, mejî û hestiyan", ji bilî pêkanîna 715 rûniştinên şûştina gurçikan û tomarkirina 30 zayînên xwezayî herwiha pêkanîna nêzîkî 3 hezar û 851 laboratîfê, 618 tomografi û nêzîkî 300 rezonansa manyetîk. Di heman demê de kilînkên derve pêşwaziya 1000 û 225 serlêdanên nexweşan kir û qebûlkirina 486 nexweşên ku di hundirê nexweşxanê de mane. Beşê lezgîn û awarte pêşwasiya nêzî 6 hezar û 500 nexweşan kir."

### Buhayên sembolîk ji bo nexweşan

Ciwan Hemê wiha da zanîn: "Nexweşxane sîstemeke sembolîk a buhayê bikar tîne, ku tê de buhayê lênerîna kilînkên derve 10 deh hezar lîreyên sûrî yên kevin e, lê buhayê qebûlkirina nexweşek bo ku di nexweşxaneyê de bimîne û tê de razê tenê 5 hezar lîreyên sûrî yên kevin e. Buhayên laboratîf û tomografi ew li gorî buhayên ku ji hêla Rêveberiya Xweser ve hatine pejirandin têne destnîşankirin. Ji bo malbatên şehîdan xizmetên tenduristiyê hemû bi awayekî bê dirav têne pêşkêş kirin, piştî ku belgeyên fermi ên şehadetê pêşkêş bikin."

Rêveberê nexweşxaneya Neteweyî Ciwan Hemê di dawî de behsa



pêdiviyên ku nexweşxaneyê hewcdariya wan e kir û wiha qedand: "Nexweşxane pir hewcedarê xebatên lênêrîn û sererastkirinê yên berfireh e, ku ji stasyona oksîjenê ya navendî dest pê dike û digihîje beş û tesîsên cûrbecûr ên nexweşxaneyê. Ji vekirina wê ya sala 2006'an û vir ve avahî nehatiye sererastkirin, ku ev yek bûye sedema xirabûna binesaziyê bi demê re. Rêveberî di qonaxa bê de ji bo ji nû ve vekirina beşa şewitandinê û beşa lênêrîna giran dixebite, ji bilî vekirina yekîneya ERCP-ê ji bo teşxîs û dermankirina nexweşiyên kezeba zirav û rêyên sefrayê bi rêya endoskopiyê.

# Projeya ziftkirina rêyên bajarê Qamişlo berdewam e

**Navenda Nûçeyan**

**Wekî beşek ji projeyên Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo ya 2026'an, projeyek zifitkirina kolanan ji bo nûjenkirin û çêkirina gelek kolanên sereke ên bajêr tê pêkanîn.**

Bi armanca baştirkirina binesaziyê û hêsankirina herikîna trafîkê, Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo, projeya ziftkirina rêyan di destpêka meha Nîsanê de da destpêkirin. Di demsala çile de, ji ber barana zêde gelek rêyên serke û duyemîn hatibûn hilwişandin, nemaze di encama zêdebûna tevgera avakirina avahiyên niştecihbûnê rêyên kolana bi awayekî berbiçav xirabûbe, ev gav hat destpêkirin da ku hunekî barê li ser şêniyan û bi taybet ajokran sivik bike.

Nivîsgeha Raghandinê ya Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo ji me re diyar kir ku ev proje di nava projeyên şaredariya bajarê Qamişlo ya sala 2026'an de bû, herwiha bi armanca baştirkirina binesaziyê û hêsankirina tevgera trafîkê, projeya ziftkirina hejmareke ji kolanên serke û duyemîn



ên barêj tê pêkanîn.

### Xebata çêkirina rêyan sala 2026'an

Di destpêka meha çaran a sala 2026'an de, xebatên amadekirina rêyan ku ji paqijkirin, qeşirandinê û rakirina beşên zirardar a hejamreke ji kolanên sereke destpêkir, di nav de rêya ku ji çerxerêya Sîvan heya çerxerêya Şehîfên Efrînê dirêj dibe, kolana Pira Keramê, rêya ji çerxerêya Bazara Goş heya çerxerêya Nisêbînê dirêj dibe.

Li gorî Nivîsgeha Raghandinê ya Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo, lêkolîna teknîkî û texmîna lêçûna projeyê di dawiya sala 2025'an hate amadekirin. Bi lêçûnek texmînkirî ya 1,300,000 dolarê Amerîkî û danîna bi tevahî 15 hezar û 950 metrekup tevliheviya ziftkirinê.

Kompaniya pêkaîna projeya ziftkirinê (kompaniya Zagros), piştî wergirtina fermana fermî ji bo pêkanîna projeyê, di dîroka 18'ê Gulana 2026'an de dest bi danîna ziftê li ser rêyan kir.

### Avakirina komîteyên taybet ji bo pejirandina rêyê herî zirardar

Derbarê pêşîniya sererastkirin û ziftrkirinê de, komîteyek pispor hate damezrandin, ev komîte bi meclisên taxan û komênan re hevrêzî kir da ku bernameyên berfireh amade bike, ji bo ku kolan û taxên ku herî zêde zirar dîtine û hewceyê lênêrîn û nûjenkirinê, destnîşan bike.

Mîna van projeyên sererastkirina rêyan bi awayekî rasterast bandorê li ser jiyana şêniyan nîşan dide, ji ber ku dibe alîkar di başkirina tevgera trafîkê herwiha demên veguhestina di navbera taxan de kêm dike. wekî din başkirina rêyan dihêle ku xirabûna erbeyên veguhestinê kêm bike, ku ji ber çal û xirabûna hin rêyên ku zirar lê hatiye bi taybet di demsala çile de, erebeyên veguhsetinê û yê şêniyan pir xirab dibû. Di heman demê de ev proje dihêle ku başûbûn di rastiya xizmetguzariyê û jîngehê de çêbibe, herwiha xweşikbûnekê dide dîmenê kolan û taxên bajêr.

### Proje dê 120 rojan berdewam bike

Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo di rêya vê projeyê hewil dide ku rêzepilanên xwe yên xizmetguzariyê temam bike. Pêşxistina toreya rêyan beşeke sereke ji pilanên şaredariyê ye ji bo bilindkirina asta xizmetên giştî û pêkanîna pêşketina bajêr ya hevseng li gorî pêdiviyên bajar yên zêdebûyî.

Derbarê dema projeyê de, wê 120 roj e dirêj bike, di nava pilanên şaredariyê ku armanca bilindkirina asta xizmetguzariyan û başkirina rasatiya rêyên bajarê Qamişlo, dike.

### Amadekarî ji bo danîna ziftê li Kolana Şehîd Rênas

Li gorî malpera fermî ya Şaredariya Bajarê Qamişlo li ser fêsbûkê, niha tîmên teknîkî dest bi amadekirina kolana Şehîd Rênas ji bo danîna zifitê dikin.

Kar ji bo misogerkirina amadekirina rê û pêdiviyên teknîkî yên pêwîst berî destpêkirina xebatên ziftkirinê, xêzkirin û paqijkirina tevahî ya rûyê kolanê û rakirina beşên zirardar tê kirin.



# Başûrê Kurdistanê: Ji têkoşînê heta statûya federal

Herêma Başûrê Kurdistanê berî ku bi fermî wek herêmek federal were nasîn, gelek qonaxên dijwar derbas kir, lê piştî gelek salan ji xebat û têkoşînê gihiştiye statûya federal. Lê siberoja wê hîn jî bi pirsgirêkên siyasî, aborî û ewlehiyê ve girêdayî ye û hewldanên têkbirina destkeftiyên Kurdan tên kirin.

**Ronahî Sedûn**

Herêma Başûrê Kurdistanê berî ku bi fermî wek herêmek federal were nasîn, gelek qonaxên dijwar derbas kir. Piştî şoreşa kurdan ya salên 1960'î û 1970'î, rejîma Seddam Huseyîn siyaseta arabîkirinê li dijî kurdan meşand. Di salên 1987 û 1988'an de kampanyaya Anfal bû sedema ku deh hezaran Kurd hatin kuştin û gelek gundan hatin hilweşandin. Piştî Şerê Kendavê yê 1991'an, kurdan bi alîkariya herêma parastina asmanî ya koalîsyonê dest bi rêveberiya xwe kirin. Di sala 1992'an de parlementoya Kurdistanê hate avakirin û bingeha xweseriya siyasî hat danîn. Piştî hilweşîna rejîma Seddam di sala 2003'an de, mafên kurdan di destûra Iraqê ya 2005'an de hate pejirandin û Herêma Kurdistanê bi fermî wek herêmek federal hate nasîn.

### Nirxandineke dîrokî (1900-2003)

Herêma Kurdistanê yekîneyeke siyasî û îdarî ya destûrî ye ku li bakur û bakurê rojhilatê Iraqê ye, ji çar parêzgehên: Hewler, Silêmanî, Duhok û Helebce pêk tê. Sînorê wê bi Îran, Tirkiyê û Sûriyê re heye.

Herêma Kurdistanê piştî Şerê Yekem ê Kendavê di sala 1991'an de, piştî vekişîna rêveberiya hikumeta navendî ji herêmê, wekî yekîneyeke siyasî û îdarî derket holê. Piştre, piştî Şerê Duyem ê Kendavê di sala 2003'an de û hilweşîna rêjîma berê ya Iraqê, herêmê rewatiya qanûnî û destûrî bi dest xist.

Deh salan berî ku Herêma Kurdistanê wekî yekîneyeke destûrî di nav Iraqê de were naskirin, Kurdistana Iraqê serdemên girîng ên hem pêşketin û hem jî paşketinê derbas kir. Di sedsala 20'an de, piştî damezrandina dewleta Iraqê, gelê Kurd li ser daxwazên xwe yên mafên neteweyî bi hikumetên navendî re di têkoşînên berdewam de bû. Ev têkoşîn di qonaxên cûda de bûn pevçûnên dirêj di navbera tevgera siyasî ya li Kurdistana Iraqê û hikumetên li pey hev ên li Bexdayê de.

### Têkoşîna gelê Kurd piştî avakirina dewleta Iraqê

Berî ku di sala 1921'an de li Iraqê monarşî were damezrandin, gelê Kurdistanê hewlên xwe ji bo bidestxistina serxwebûnê ji Mandata Brîtanî zêde kirin. Serhildana Şêx Mehmûd Berzencî ya sala 1919'an yek ji hewldanên cidî yên gelê Kurd bû ji bo avakirina hebûneke serbixwe li Kurdistanê. Serhildanên Barzan ku di destpêka salên 1930'an de dest pê kirin û heta nîvê salên 1940'an berdewam kirin, têkoşîna gelê Kurd ji bo mafên xwe yên neteweyî hîn bêtir geş kirin. Di van salan de pevçûnên berdewam di navbera rêjîma serdest û şoreşgerên Kurd de çêbûn.



Şoreşa Îlonê û Peymana 11'ê Adara 1970'an

Nakokiyên kûr ên ku piştî sala 1960'î di navbera hikumeta navendî û serokatiya siyasî ya Kurd de derketin holê, bûn sedema şoreşek berfireh li Kurdistanê ku di 11'ê Îlona 1961'an de dest pê kir. Vê şoreşê kontrola îdarî li deverên di bin kontrola xwe de girt destê xwe û di heman demê de bi artêşa rêjîmê re rû bi rû ma. Ev berxwedan bû sedema peymana 11'ê Adara 1970'an ku di navbera Kurd û hikumeta navendî de bi serokatiya Mustefa Barzanî di derbarê xweseriyê li Kurdistana Iraqê de, hat îmzekirin. Ev peyman wekî yekem naskirin û pejirandina fermî ya mafên bingehîn ên gelê Kurd ji hêla hikumeta navendî ve hat hesibandin. Lê belê, demek dirêj derbas nebû ku hikumeta navendî peymana Adarê binpê kir, di encamê de danûstandin bi dawî bûn û di Adara 1974'an de şer û pevçûnên di navbera her du aliyan de ji nû ve dest pê kirin. Piştre peymana 6'ê Adara 1975'an a di navbera Îran û Iraqê de hat, li gorî vê peymanê ew bû ku wê hikumeta Bexdayê beşek ji avên axa Iraqê li Şett el-Erebê di berdêla zexta Îranê li ser hêzên Pêşmerge de da Îranê, ev yek bû sedema têkçûna Şoreşa Îlonê.

### Vejîna şoreşê (1975-1991)

Di demek kurt de piştî têkçûna Şoreşa Îlonê, şoreş li çiya û geliyên Kurdistanê ji nû ve geş bû. Li hember vê yekê, rêjîma serdest polîtîkayên êrişkar ên bêhempa ji bo tepeserkirina şoreşê û bindestkirina gelê Kurd pejirand, bi sûdwergirtina ji rastiya leşkerî û hovîtiya dîktatorî ya ku di şerê wê yê li dijî Komara Îslamî ya Îranê de serdest bû. Ev yek bû sedema operasyonên Enfalê û karanîna çekên kîmyewî li dijî sivîlên bêçek ên Kurd. Şerê Îran-Iraqê di sala 1988'an de bi dawî bû, piştre dagirkirina Kuweytê ji aliyê Iraqê ve û Şerê Kendavê yê Yekem di sala 1991'an de ku hemîyan rê li ber serhildana gelê Kurdistanê di Adara 1991'an de vekirin. Xala sereke ya werçerxê dema ku Neteweyên Yekbûyî û civaka navneteweyî herêmek bêfirîn ava kirin (Biryara Konseya Ewlekariyê 688) çêbû ku rê li ber hikumeta Iraqê girt ku li beşek mezin ji axa Kurdistanê operasyonên leşkerî bike. Ev herêma bêfirîn bû bingeha damezrandina Herêma Kurdistanê û paşê bû yekîneyeke destûrî di Iraqa federal de.

### Enfal û Helebce

Di bin navê Enfal de, hikumeta navendî ya Iraqê di nîvê duyemîn ê salên 1980'yî de kampanyayek sîstematîk da destpêkirin, da ku berxwedana gelê Kurd û hêzên Pêşmerge qels bike. Ev kampanyaya leşkerî di qonaxan de pêk hat, ji sala 1986'an dest pê kir û heta dawiya sala 1988'an berdewam kir. Zêdetirî 180 hezar welatiyên Kurd di dema Enfalê de jiyana xwe ji dest dan an jî winda bûn. Dadgeha Cezayê Navneteweyî ya li lahayî Enfal wekî kampanyayek qirkirineke komî bi nav kir. Di heman demê de bi vê kampanyayê re, Helebce şahidiya yek ji tawanên şer ên herî tirsnak kir ku ji hêla hikumeta navendî ve di 16'ê Adara 1988'an de hat kirin, dema ku wê bajar bi çekên kîmyewî bombebaran kir. Encam şehîdbûna zêdetirî 5 hezar welatiyan û bandorên demdirêj ên çekên kîmyewî li ser bi hezaran kesên din bû.

### Qonaxa Rêveberiya Xweser (1992-2003)

Piştî bidawîhatina Şerê Kendavê û vekişîna artêşa Iraqê ji herêma qedexeya firînê ya li bakur di sala 1991'an de, Eniya Kurdistanê ku ji partiyên siyasî yên Kurd pêk dihat, kontrola Herêma Kurdistanê girt destê xwe. Wê roleke girîng di parastina ewlehiyê û pêşîgirtina li valahiyek ewlehiyê li Herêma Kurdistanê de lîst. Di sala 1992'an de, gelê Herêma Kurdistanê hilbijartinên xwe yên demokratîk ên azad û yekem pêk anîn, yekem parlemento û hikumeta xwe ya xwerêveber hilbijartin û federalîzm wekî çarçoveya têkiliya xwe bi dewleta Iraqê re hilbijartin.

### Şerê navxweyî (1994-1998)

Ezmûna xwerêveberiyê li herêmê bê nakokiyên siyasî nebû, ev nakokî di nav hêzên siyasî yên Kurd de bi kûrahî kokên xwe hebûn û di dawiyê de bûn sedema şerê navxweyî ku çend salan dom kir. Ev şer partî û aliyên cûda yên Herêma Kurdistanê tê de beşdar bûn, ev jî yek ji demên herî dijwar ên dîroka herêmê bû. Şerê navxweyî di sala 1994'an de dest pê kir û di sala 1998'an de bi navbeynkariya Amerîkayê bi dawî bû.

### Serdema rêveberiya dualî (1998-2005)

Piştî bidawîbûna şerê navxweyî, li Herêma Kurdistanê du rêveberiyên siyasî û leşkerî yên cuda hatin damezrandin. Hewler û Duhok ketin bin yek rêveberiyê, Silêmanî û Germiyan jî ketin bin ya din. Li Hewlêrê û Silêmaniyê du hikumet û rêveberiyên cuda hatin damezrandin. Di heman demê de, civaka navneteweyî cezayên aborî yên tund li ser Iraq û Herêma Kurdistanê ferz kir, şert û mercên jiyanê yên jixwe dijwar li herêmê girantir kir û bû sedema pêlek koçberiyê ya mezin.

### Yekbûna herdu rêveberiyan (2005-2017)

Piştî hilbijartinên 2005'an, rewşa du-îdareyan di asta hikumet û parlementoyê de bi dawî bû û hikumeteke Herêma Kurdistanê ya yekgirtî li Hewlêrê hate damezrandin. Di heman demê de û li gorî Destûra Iraqê, Herêma Kurdistanê di salên piştî 2005'an de bi awayekî çalak beşdarî pêvajoya siyasî ya Iraqê bû û bi lîsteyek yekgirtî ya hêzên siyasî yên Kurd beşdarî hilbijartinên parlementoya Iraqê bû. Di vê heyamê de, Herêma Kurdistanê mezinbûneke girîng a pêşketin û aborî jiya û bazarên wê geşbûneke bêhempa dîtin.

### Nûkirina pirsgirêkan bi hikumeta Federal re (2007-2017)

Destûra Iraqê destnîşan kiribû ku pirsgirêka herêmên nakokî li ser wan heye ku di madeya 140'î de bi hûrgilî hatiye destnîşankirin, heta dawiya sala 2007'an çareser bibe. Ev çareserî diviyabû bi rêya normalîzekirina rewşa van deveran, vegera niştecihên wan ên resen bo malên xwe, pêkanîna serjimêriyekê û dû re jî lidarxistina referandûmekê bihata bidestxistin. Nebicîhanîna madeya 140 li gorî dema destûrî, digel nebûna fînansmanê (temwîl) hêzên Pêşmerge wekî beşek ji dezgeha ewlehiyê ya Iraqê û negihîştina rêkeftinan li ser derxistin û firotina petrolê, rê li ber kûrtirkirina nakokiyên di navbera Bexda û Hewlêrê de vekir.

### Referandûm (2017)

Referandûma li ser serxwebûna Herêma Kurdistanê û deverên nakokîdar di 25'ê Îlona 2017'an de pêk hat. Di referandûmê de, ji sedî 92 zêdetir nifûsa Herêma Kurdistanê û deverên nakokîdar dengê xwe dan serxwebûnê. Hikumeta federal a Iraqê red kir ku referandûmê nas bike, di encamê de di navbera Bexda û Hewlêrê de careke din nakokî û alozî çêbûn.

### Hevjiyan di navbera pêkhateyên Herêma Kurdistanê de

Herêma Kurdistanê di warê hevjiyaneke aştiyane, rêzgirtina mafên netewe û olan de li Rojhilata Navîn wekî cihekî ewle tê hesibandin. Gelê Kurd û çanda serdest a li herêmê bi tundrewiya olî, mezhebî an neteweperestî nayên nasîn, ev rastiyek e ku Herêma Kurdistanê di herêmê de avantajek daye. Tirkmen, Xiristiyanên ji netewên cûda, Êzîdî, Şebek û Zerdeştî hemû di nav wê de çalakên siyasî û civakî ne. Piraniya van civakan li Iraqê, bi taybetî civaka Xiristiyan, di nav sînorên îdarî yên hikumeta Herêma Kurdistanê de dijîn. Ew di parlemento û hikumetê de têne temsîlkirin, ji mafên xwe yên çandî kêfxweş dibin û nasnameyên xwe yên neteweyî diparêzin. Gelek salan jî Parlamentoya Kurdistanê zimanê Tirkmenî û hem jî yê Suryanî wekî zimanên fermî nas kiriye, dibistanên Suryanî û Tirkmenî li seranserê Herêma Kurdistanê hene. Dîroka Xiristiyan, Êzîdî û Şebekan ji ber cihê erdnîgarî yê herêmên wan tijî çîrokên trajîk e. Ev bi taybetî ji bo Êzîdiyan rast e ku serokatiya Herêma Kurdistanê wan wekî Kurdên xwecihî yan jî resen bi nav dike. Ew di seranserê dîrokê de rastî gelek qirkirinan hatine û ya herî dawî jî bi destê çeteyên DAIŞ'ê. Ji xwe rêveberiya siyasî û Hikumeta Herêma Kurdistanê bi berdewamî piştrast kirine ku herêm welatekî hemû welatiyên xwe ye û divê her kes beşdarî rêveberiya wê bibe û ji maf û berpirsiyariyên wekhev sûd werbigire.

### Rewşa niha

Başûrê Kurdistanê di dema dawiyê de, bi taybetî piştî şerê Îsraîl û Amerîkayê li dijî Îranê, krîzeke siyasî ya giran dijî. Ji aliyekî ve rastî êrişên Heşte Şaebî û artêşa Îranê dihat, ji aliyê din ve jî di bin zextên hikumeta Iraqê û Tirkiyê de maye. Bi taybetî piştî axaftinên li ser çekdanîna Heşte Şaebî û çekdanîna Pêşmergeyan, ev mijar ji aliyê Tom Barrack ve hate nîqaşkirin. Li aliyekî din, pirsgirêkên di navbera PDK û YNK'ê de hene, radestkirina Kerkûkê ji bo Turkmenan xetereyeke mezin bi xwe re tîne. Herwiha siyaset û komployên ku niha li ser Başûrê Kurdistanê têne meşandin, ji siyasetên dijminatiya Kurdan û armanca bihêştina wan bê statû ne qûte. Li hemberî vê yekê ji bo ku Kurdên Başûrê Kurdistanê satûya xwe biparêzin pêwîst e ku nakokiyên heyî ji nav xwe rakin û lihevkirinek giştî pêk bînin. Ji ber guhertinên ku niha li Rojhilata Navîn tên jiyankirin, bandoreke mezin li ser hemû deveran heye, Başûrê Kurdistanê jî di nava vê bandorê de ye, lewra girîngiya parastina herêma federal û destkefiyên Kurdan li Başûrê Kurdistanê gelekî mezin e.

# Kongra Islama Demokratîk: Divê destûr li gorî taybetmendiyên gelên Sûriyê be

Hevserokê Kongra Islama Demokratîk Mihemed Xerzanî destnîşan kir ku eger destûr ilmanî be, olî be, çi be ku desthilatdarî xwe li ser gelan ferz bike, yekrengiyê pêkbîne û rêzdariya cihêrengiyê negire, wê ev destûr neyê qebûkirin. Lewma divê destûrek li gorî taybetmendiyên hemû gelên Sûriyê were sazkirin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**






Yekem destûra Sûriyê di 11'ê Tebaxa 1930'î de destûr bi dawî bû û di meclîsê de daket dengdanê û hat qebûlkirin. Di vê navberê de gelek guhartin hatin pêkanîn, lê ev destûr heyanî sala 1949 berdewam kir. Di vê destûrê de navê welat bûbû Komara Sûriyê, tê de taybetmendiya gelên Sûriyê li ber çavan dihat derbaskirin.
Sal û 3 meh li ser ragihandina destûrî ya Sûriyê derbas bû, ji ber ku rengê ola radîkal a Islamê tê de li pêş bû, hem jî yekrengî hatibû destgirtin, ango dûrî rastiya dîrokî ya gelên Sûriyê bû, di dema heyî de daxwaza her kesî destûreke demokratîk ku mafê hemû gelên Sûriyê biparêze, ye. Êdî pirs ev e, bê ola rasteqîn û Xweda çawa vê mijarê digirin dest, gelo ol dijî cihêrengiya civakî, çandî û bîrweriyê ye an desthilata ku ol ji bo xwe bi kar tîne?
Derbarê heman mijarê hevserokê Kongra Îslama Demokratîk Mihemed Xerzanî ji rojnameya me re axivî.

**'Destûra yekalî ya Baas hişt rewşa Sûriyê bigihêje vê astê'**

Mihemd Xerzanî diyar kir ku destûra yekalî ya ku Baasê ferz kirbû hişt kirîz li Sûriyê dest pê bike û bigihêje vê astê û wiha got: "Bêguman destûr ji bo rêvebirina welatekî ye, ew welatê xwedî yeknetew, yek ol û yek çand be, dikare li gorî vê yekrengiyê destûrekî saz bike. Lê dema ku welatekî pirnetew, pir ol û pir birdozî be divê hemû gel cihê xwe di vê destûrê de bibînin. Ev nakokiyên ku temenê wê 15 sal bû, şer, wêrankirina malan, koçberkirina bi milyonan kes û kuştina bi sed hezarên kesan bi dirêjahiya vê serdemê re hat kirin. Sedema vê xerabiyê danîna destûreke yekalî ya Sûriyê bû, di wê destûrê de weke xaleke bingehîn ew bû ku Partiya Baas rêveberiya welat û milet bike. Partiya Baas jî xwedî nijadperesiyeke şofînî ya yekalî bû, kesên ku bi vê partiyê re ba wê nanê wan hebaya û dikarîbûn bi xweşî bijîn, kesên ku ne bi vê sîstemê re baya jiyan lê zehmet bû. Weke hat tekezkirin ku destûra yekalî ya ku Baas saz kiribû bû faktoreke xerab û hişt rewşa Sûriyê bigihêje vê astê. Bi hatina hikumeta Sûriyê ya demkî re êdî ragihandina destûrî re hat nivîsîn, ev yek çendîn ne li gorî dilê gelên Sûriyê be jî tiştek bû û derbas bû, lê ya girîng destûra bingehîn e."

**'Pêxember li Medîneyê sîstemek fedral ava kiribû'**

Mihemed da zanîn ku Pêxemberê Xwedê li Medîneyê sîstemeke federal ava kiribû û wiha bi lêv kir: "Dema ku Pêxember Muhemed çû Medîne Elminewere, weke fedraliyetekê li wir da avakirin, di wê demê de li gorî pêkhateyên bajêr ev şêwazê xwerêvebirinê ava kir. Di Medîneyê de kesên ne Misliman, Cihû, Xirstyan, Mislimanên Muhacir û Ensar hebûn, dema ku Pêxember çû Medîneyê serweriya xwe li ser tevahiya wan ferz nekir. Wî behsa her qebîle û rengê pêkhateyekê dikir û tekez dikir ku her beşek li gorî taybetmendiya xwe, xwe bi rê ve bibe, ji ber vê yekê Pêxember lêvegera her beşeke civakî ya Medîneyê mîna axa û serokqebîleyên, çêkirbû. Di nava her pêkhateyekê de wê pirsgirêk bi destê wê werin çareserkirin û ew ê xwe bi rê ve bibin jî. Tişta di Medîneyê de hevbeş, parastina bajêr û berxwedaniya li hember êrişên ji derve bû. Gelên Medîneyê bi hev re parastina xwe dikirin, wekî din her pêkhateye bi rengekî xweser xwe bi rê ve dibirin. Nimûneya Medîneyê nimûneyeke ji rengê rêvebirina wê serdemê, li gorî pêşveçûna cîhanê, guhertinên ku çêbûne, êdî şêwazê rêvebirinê bûye bi rengekî xwaser, li gelek welatan ev yek pêkan e, hin welat hene her herêmeke wê xwedî destûrekê ye, lê destûreke giştî heye ku kar û barên saziyan û hin mijarên din digire nava xwe."

**Divê bi navê Xwedê biryaran negirtin**

Xerzanî tekez kir ku divê bi navê Xweda biryar neyên girtin ji ber ku wê neyê zanîn bê wê rast yan şaş were pêkanîn û wiha domand: "Dema ku tevgereke Islamî desthilatdariyê bike û şêwazê wê yekalî be, êdî gelek tevgerên din ên Isalamî yên din wê nerazîbûna xwe li hember bidin nîşandan, wê bigihêja asta rûdana şerên xwînî di navbera wan de. Her beşek û her bîrdoziyeke Isalamî bi rengekî cuda biryar û fitweyan derdixe, ev yek jî bi navê Xwedê tê kirin. Di ola Islamê de hemû mezheb û bîrdozî derheqê her tiştekî girêdayî Xweda, ol û hwd… li hev nekirine, di heman demê de her yek li gorî xwe her tiştî şîrove dike. Ev yek nabe, divê bi navê Xwedê biryar neyê dayîn. Pêxember Muhemed carekê ji serleşkerekî re got eger dijminan ji te xwest ku hukim yê Xwedê û Pêxember bi cih bibe, vê yekê qebûl neke, ji ber ku wê neyê zanîn bê wê rast yan şaş were pêkanîn, lê belê di nav xwe de hukimekî çêbikin û binerin ka heya çi radeyê dikeve xizmeta giştî de, gelo baş e yan na, di heman demê de bêjin ev hukimê yê me ye. Em dizanin ev hikumeta nû di bingeha xwe de li Idlibê hemû kom bi yekrengî, şerîeteke hevbeş, yek ol û yek hêza leşkerî rêveberî didan meşandin. Piştî ev hikumeta nû hat ser desthilatdariyê wê nas kir ku êdî nema sîstema Idlibê guncav e ji bo Sûriyê û nas kir ku divê guhertin çêbibe. Di nava desthilatdariya Sûriyê de nakokî hene, negihaye asta nakokiyên çekdarî, lê gelek hevalên Şeri ji wî ne razî ne. Ew bi xwe dizanin wê bi rengê hişk ê ku li Idlibê dihat meşandin, welat neyê birêvebirin"

**'Eger destûrê Sûriyê demokratîk be wê destûreke pêşketî be'**

Hevserokê Kongra Islama Demokratîk Mihemed Xerzanî dest nîşan kir ku eger destûra Sûriyê mîna Hevpeymana Civakî be wê destûreke pêşketî be û wiha bi dawî kir: "Ragihandina destûrî ya hikumeta demkî bi rengekî lez hat danîn da ku rehetiyek çêbibe, têbîniyê me û piraniya siyasetmedar li ser hebû, ev yek derbas bû, ya girîng ji bo me destûrê ku wê were amadekirin bi çi rengî be. Tekez e ku li gorî daxwaz û taybetmendiya hemû gelên Sûriyê herwiha pirrengiyê destûreke mayînde were amadekirin. Destûreke ku mafê hemû neteweyan tê de parastî be wê dijmin jê re tune bin, lê eger ne li gorî dilê hemû neteweyan were çêkirin helbet wê pirsgirêk derkevin. Eger destûr ilmanî be, olî be, çi be, ku desthilatdarî xwe ferz bike li ser gelan, yekrengiyê pêkbîne û rêzdariya cihêrengiyê negire wê ev hikumet neyê qebûkirin ji aliyê gelan ve. Lewma jî ji bo Sûriyeke hevgirtî ava bibe û mafê her kesî tê de parastî be û ev yek li gorî destûrê be divê hin gav bên avêtin. Divê kombûna nûnerên her netewekê yên Sûriyê li hev bicivin, piştî avakirina parlementoyeke giştî ji gelên Sûriyê kongreyeke niştîmanî li dar bixin û li ser vê bingehê destûrekê amade bikin. Dema ku Hevpeymana Civakî hat derxistin, gihaşt ber destê me, me lê nerî û xwend, tiştekî rasteqîn e ku şêwazê xwerêvebirinê yê herî guncav bû ji bo herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji ber ku wê taybetmendiya hemû gelan diparast. Hevpeymana Civakî wekî destûreke demokratîk bû, destûreke wiha di dema heyî de were amadekirin wê ji bo Sûriyê destûrekî gelekî pêşketî be."



# Karkirina zarokan hîn jî bandorê li 138 milyon zarokên li çaraliyê cîhanê dike

Tevî hewldanên berdewam ên navneteweyî, 138 milyon zarok li çaraliyê cîhanê hîn jî di şert û mercên ku wan ji perwerde û ewlehiyê bêpar dikin de dixebitin, di nav de 54 milyon zarok bi karên xeternak re rû bi rû ne, di rewşek ku nîşan dide ku pirsgirêkek mirovî heye ku bersivek gerdûnî ya lezgîn hewce dike.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**



Karkirina zarokan diyardeyek e ku behsa îstismara zarokan di her şêweyekî kar de dike ku zarokan ji zarokatiya wan mehrûm dike, rê li ber şiyana wan a çûna dibistanê digire û bandorek neyînî ya derûnî, laşî, civakî an exlaqî ya zirardar dike. Bi mîlyonan zarok di navbera rastiyên dijwar ên kar û mafên binpêkirî yên zarokatiyê de asê mane.

**Hejmar mezinahiya pirsgirêkê eşkere dikin**

Li gorî Rêxistina Navneteweyî ya Kedê (ILO), li çaraliyê cîhanê nêzîkî 138 milyon zarok di karên zarokan de dixebitin, di nav wan de 54 milyon zarok di karên xeternak de dixebitin ku dikarin bibin sedema birîndariyên mayînde, nexweşiyên pîşeyî, an jî zirara giran a fîzîkî û psîkolojîk. Tê texmînkirin ku zarokên dixebitin rêjeyek girîng a koma temenê 5-17 salî li gelek welatên kêm dahat û navîn pêk tînin, ku keda wan di çandinî, pîşesaziyên biçûk, maden, xizmetên navmalî, firotina li kolanan û berhevkirina bermayiyan de kom dibe. Tevî kêmbûna hejmaran li gorî dehsalên berê, civaka navneteweyî hîn jî ji gihîştina armanca jiholêrakirina tevahî ya keda zarokan, ku yek ji armancên pêşveçûna domdar a Neteweyên Yekbûyî ye, dûr e.
Xizanî hîn jî sedema sereke ya keda zarokan e û hin malbatan neçar dike ku zarokên xwe bişînin ser kar da ku dahata xwe temam bikin û pêdiviyên bingehîn bicîh bînin. Bêkarî, mûçeyên kêm û lêçûnên jiyanê yên zêde zextên aborî yên li ser malbatan hîn zêdetir dikin. Şer û pevçûnên çekdarî, karesatên xwezayî, penaberî û koçberiya bi darê zorê jî dibin sedema ku bêtir zarok bikevin bazara kar, nemaze li deverên ku xizmetên perwerdehî û civakî kêm dibin. Wekî din, sepandina lawaz a qanûnan an nebûna çavdêriya li cihê kar dihêle ku îstismara zarokan di hin pîşeyan de berdewam bike.
Karê zarokan ne tenê zarokan ji perwerdeyê bêpar dihêle, lê di heman demê de bandorê li tenduristiya wan a laşî û derûnî û perspektîfên kariyera wan a pêşerojê jî dike. Xebata demjimêrên dirêj di jîngehên ne ewle de dikare bibe sedema birîndariyên giran an nexweşiyên kronîk, bandorê li pêşveçûna normal a zarokan dike û lawaziya wan a li hember tundûtûjî an îstismarkirinê zêde dike. Ji aliyê perwerdehiyê ve, devjêberdana ji dibistanê şansên zarokan ji bo bidestxistina karên baş di pêşerojê de kêm dike, çerxa hejariyê di nav nifşan de didomîne û bandorê li pêşketina aborî û civakî ya civakan dike.

**Pîşeyên ku herî zêde bi keda zarokan ve girêdayî ne**

Sektora çandiniyê rêjeya herî mezin a zarokên karker dixebitîne, ku beşdarî çinîn, şivantiya ajalan û karanîna amûrên ku dibe ku ji bo temenê wan xeternak bin dibin. Yên din di kargehên biçûk, şantiyeyên avakirinê, maden, bazar, karûbarên navmalî û berhevkirina materyalan de dixebitin. Di hin rewşan de, zarok rastî îstismara bazirganî an xebata neqanûnî tên, ku ev yek jî lawaziya wan zêde dike û wan dixe ber xetereyên girîng.
Rêxistina Navneteweyî ya Kedê (ILO), bi hevkariya hikûmetan, ajansên Neteweyên Yekbûyî û civaka sivîl, berdewam dike bi pêkanîna bernameyên ku armanc dikin kêmkirina keda zarokan bi rêya baştirkirina gihîştina perwerdehiyê, xurtkirina parastina civakî û dabînkirina piştgiriya aborî ji malbatên xizan re. Peymanên navneteweyî her wiha banga qedexekirina awayên herî xirab ên keda zarokan dikin û tekez dikin ku pêdivî bi hawîrdorek perwerdehiyê ya ewle û mecbûrî heye, di heman demê de cezayan li ser kesên ku zarokan di karên ku tenduristî an jiyana wan dixe xetereyê de îstismar dikin, ferz dikin. Ezmûna li çend welatan piştrast dike ku hevgirtina perwerdehiya belaş, bernameyên alîkariya dravî ji bo malbatan û derfetên kar ên çêtir ji bo mezinan dikare bi girîngî beşdarî kêmkirina diyardeyê bibe.
Hejmarên keda zarokan rastiyek êşdar nîşan didin ku bi mîlyonan zarok li çaraliyê cîhanê pê re rû bi rû dimînin, ku salên zaroktiyê li şûna ku bibin demek ji bo fêrbûn, lîstin û mezinbûnê, vediguherin karekî dijwar. Tevî pêşketinên ku di salên dawî de hatine kirin jî, hebûna 138 mîlyon zarokan di bazara kar de, ku 54 mîlyon ji wan di karên xeternak de ne, destnîşan dike ku hîn rêyek dirêj li pêşiya me heye ku vê diyardeyê ji hole rakin. Veberhênan di perwerdehiyê de, piştgiriya malbatan, sepandina qanûnan û xurtkirina hevkariya navneteweyî hemî amûrên girîng in da ku her zarokek ji mafê xwe yê zarokatiyek ewle û pêşerojek çêtir sûd werbigire.

## 'Binpêkirina zagonên tirafîkê jiyana mirovan dixe xeteriyê'

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Rêveberê Navenda Tirafîkê ya bajarê Girkê Legê Rêzan Ehmed diyar kir ku her mirovekî ku zagonên tirafîkê binpê dike jiyana xwe û ya derdora xwe dike xeteriyê de. Ehmed tekez kir ku ew ê di demên pêş de biryara qedexekirina motoran bi cih bînin.**

Li seranserî Rojavayê Kurdistanê qezayên tirafîkê zêdebûne, bi taybet li bajarê Girkê Legê û gundewarên girêdayî wê ku di vê mehê de 25 qezayên tirafîkê rûdane û 12 ji wan qezayan bi rêya matoran bûn, ev yek jî xeteriyekê li ser jiyana ajokar û welatiyan çêdike.
Di derbarî qezayên tirafîkê yên ku rû didin û biryara qedexekirina matoran, rêveberê Navenda Trafîkê ya bajarê Girkê Legê Rêzan Ehmed ji Rojnameya me re axivî.



**'Binpêkirina zagonan dibe sedema qezayan'**

Rêzan Ehmed anî ziman ku karê tirafîkê rêxistinkirina cûnûhatinê ye û wiha got: "Rojane tîmên tirafîkê derdikevin nava bajêr da ku rê li ber qezayan bigirin û erebeyan bi rêk û pêk bikin. Ji bilî di hundirê bajêr de tîmên me li derveyî bajêr jî disekinin. Di milê ewlehiyê de têkiliya me bi Asayîş û polîsên leşkerî re jî heye, di heman demê de têkiliya me bi saziyên mîna şaredarî, meclis û navenda çûnûhatinê jî re heye. Karê me di vê dema dawî de girantir bûye ji ber ku şaredarî dest bi karê zivitkirina riyan kiriye û tîmên me jî di xizmetê de ne da ku rê bi dispilîn bikin û astengî ji gel û ji şaredariyê re çênebe. Li kêlek vê yekê tê dîtin ku qezayên tirafîkê zêde bûne ev yek encama binpêkirina zagonên tirafîkê ne ku gelek ajokar hene temenê wan hîn negihiştiye 18 salî û bi awayekî lez erebeya diajonin, ew him zirarê dighînin xwe him jî ajokarê pêşberî xwe. Herwiha gelek kes hene dema erebeyan diajonin li derdora xwe nanerin û bilez rê qut dikin ev yek jî dibe sedema qezayên tirafîkê."

**'Biryara qedexekirina matoran wê didemê pêş de pêk were'**

Rêveberê Navenda Trafîkê ya bajarê Girkê Legê Rêzan Ehmed axaftina xwe wiha qedandin: "Gelek kes hene li ser riyên giştî diçin û bi telefonê mijûl dibin, hişê wan ne li rê ye û zagonên trafîkê jî binpê dikin, di encama vê xemsariyê de gelek kesan jiyana xwe ji dest dan. Herwiha ji parêzgeha Hesekê biryara qedexekirina matoran derket di bajêr de û ji derveyî bajêr, ev biryar derket ji ber ku piraniya kesên ku matoran diajonin temenê wan di bin 18 salî re ye û gelek caran matoran bi awayekî şaş û xeternak bikar tînin, ev yek jî dibe sedema qezayên Tirafîkê. Li aliyekî din bi rêya matoran gelek dizî çêdibin, gel jî gilî dikin ji ber dengê motoran û ji ber ku ew dibin sedema neramîbûnê. Heya niha me biryar pêk neaniye di, demên pêş de wê biryara qedexekirina motoran pêk were û sîstema pêkanîna wê hîn ne diyare, ji ber ku gelek endamên saziyan malên wan jiderveyî bajêrin û bi riya matoran diçin û tên lewma ji bo wan helbet wê çareseriyek hebe. Em bi hêvîne gel jî amade be ji bo vê biryarê û bi me re bibin alîkar ji ber ku ev erkê me ye lewma em neçarin vê biryarê pêk bînin."



Hafiz Ahmet Turhalli

## Şerm û heya ji îmanê ne

Civaka kû îro bi navê bawerî û çandê jiyanekê dijî, ji prensîbên bingehîn yên mirovbûnê dûr dikeve. Mirovbûn divê bi xwe re jiyanekî bi wate bîne. Ger mirovbûn tenê jiyanekî xwarin, vexwarin, razan û zarokçêkirinê were jiyîn, tu cudahî navbera ruhberên dîtir û mirovan de namîne! Mirov bi eql û îrade û bi pîvan û têghiştin kare bibe mirov. Ew nirxên kû mirov ji ruhberên dîtir cûda dike, divê werin zanîn. Kesê/Kesa dixwaze jiyanekî birumet weke mirov bijî, bêguman divê pîvanên ku mirovî ji ruhberên dîtir cudatir dikin hebin.
Kapîtalîzma wehşî bi taybet êrîşa nirxên civakê dike û civakê bê parastin dihêle.
Ji kesayetan jixwere bendeyan (Koleyan) binavê karkerî û karmendî perwerde dike û hemû enerjiya mirovî ji bo wê xerc dike.
Ger mirov ji erken xweyê bingehîn were cûda kirin, Mirov dibe beşer û tenê weke rihberekî dijî.
Heya û Şerm: Ligor ola Îslamê tişta herî binirx heya û şerme. Tiştê mirovî ji rêderketinê diparêze şerme, heyaye. Di Qur'an a pîroz de weke heya û şerm gotin nehatine bikaranîn. Lê weke Îffet, hesta jixwe şermkirinê hatiye vegotin û kesê xwedan heya, weke têkiliya navbera xwe û Xweda ji dil avakiriye. Ayetên ku bi giringî behsa hestên şermê kirine evin: "Ji zilamên û jinên bawermendanre beje; bila çavên xwe ji heramê durxînin. (Nur 30 û 31) Ji kiryar û ramanên nebaş şerm bikin."
"Kesê/Kesa dixwaze bêşermbûnê di nava civaka bawermendande belav bike, li dinya û axretê ji bo wanan ezab heye." (Nur 19)
Gelî Mirovan! Ji bo hûn cîhên xweyên veşartî bipêçin, me ji were çek û ciluberg şandin. Lê cilûbergên Teqwayê (Berpirsiyarî) ji wan cilubergan bi xêrtire." (Araf 26)
Di dawîya vê ayeta han de, behsa şermê û heyayê weke cilubergan hatiye vegotin. Kesê/Kesa di jiyana wêde Şerm û heya nîn be, çiqas cilubergên buha û xweşik jî li xwe bike, tê wateya ev kesayet ji rê derketiye û tenê zerara wê digîhije civakê.
Gotinên Pêxember: "Heya şerm perçeyek ji baweriyêye". "Heya tene qenciyê diafirîne." "Her baweriyekî rawiştekî wê heye, naveroka Rawişta Îslamê heya ye." "Ger tu şerm nakî, tu çi dixwazî pêk bîne." Evana gotinên Resulullah'in.
Bê guman ger kesayet heya û şerma xwe hunda bike kare her tîştî bike. Ji bo wê kesayetê tu perde namîne û dikare hemû cureyên nebaşiyan pêk bîne.
Dinava Civaka me Kurdistaniyan de ji ber şerm hebû, mirov di aramiyê de bûn.
Kesekî dizî bikira dinava civaka Kurd de nedihatan hebandin, millete Kurd deriyên wan vekirîbûn û her kesekî karibun mal û samanê xwe liderve bihiştana. Ger gur û heywanên goştxwar tunnebiyan, pezê gelê Kurd 6 mehan li çolan diman.
Ji şerman û tirsan kesê çavê xwe bera namûs û malê xelkê nedidan.
Kesên derewker tu qîmeta wan di nava civakê de çênedibûn.
Kesên camêr û xwedan taybetmendiyan, ji derew û diziyan dûrbûn.
Kesên nebaşî bixwestana jî ji civakê û derudora xwe şerm dikir.
Mixabin neha ev nirxên giranbuha weke heya û şerm ji nava me hatine rakirin. Di rastiyê de Kapîtalîzma wehşî û desthelat, şuna şerm û heyayê; xapandin, derew û dizî bicîh kir.
Civaka ku ji hêla van desthelatan ve hate perwerdekirin, şerm ji holê rakir. Divê em nuh de şermkirin û heyayê di nava civaka xwe de ava bikin. An na dê civak birize û têk biçe.